



Stara stranan

Mîna tu ji çivîkan re bêjî tu çivîk î lê nefire, ji wan re gotin hûn bilbil in lê nestirên dengê we bila li vê dinê nemîne. Wan bi ya dilê xwe kirin û dengê wan hîn jî li dinê ye û ew ê wer li dinê bin... Bi stranan sitirîn... **Mefer Kurdil / R.8**



Bindestî û vegera li xwebûnê

Di dîroka Kurdistanê û Rohhilata Navîn de, şopa dagirkeriya dewleta tirk di destpêka sedsala 19' emîn de û di heman demê de dagirkeriya welatên biyanî ku serweriya xwe bêsînor li cîhanê belav dikirin, xuya ye... **Sozdar Koçer / R.8**



Amûran fêrî kurdî dikin

Koma Kurdish Crowdsourcayê ya xebatên teknolojîkirina kurdî dimeşîne, bi Common Voiceyê dengên kurdî qeyd dike û amûrên elektronîk fêrî kurdî dike. Têkildarî xebatên Kurdish Crowdsourcayê em bi endamê komê Amed Çeko Jiyan re axivîn... **R.11**

xwebûn

22-28 SIBAT 2021 HEJMAR: 62 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Greva birçîbûnê ket meha 4'emîn

Li girtîgehên Tirkiye û Kurdistanê girtiyên siyasî li dijî tecrîdê û zextên li girtîgehên dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kirin û çalakîya ku li bi dehan girtîgehên hatiye despêkirin 3 meh li pey xwe hiştin û ket meha 4'emîn. Hevserokê Komeleya Alîkariya Ji Bo Malbatên Girtiyên (TÜAY-DER) a Şaxa Sêrtê Tahîr Cengîz bal kişand ser asta çalakîya greva birçîbûnê û bang li raya giştî kir ku xwedî li çalakîyê û daxwazên girtiyên derkeve. Hunermend Rotînda û Seyîdxan, ji bo çalakîyên greva birçîbûnê bang kirin. Seyîdxan anî ziman ku tecrîdkirina Ocalan heqaret e ji gelê kurd re... **R.3**

Qebûl kirin ku MÎT'ê qetlîam kiriye

Serokê Daîreya Îstixbaratê yê Serfermandariya Giştî yê berê Îsmail Hakî Pekî, di bernamêyeke televizyonê de rola MÎT'ê ya di qetilkirina her sê jinên kurd ên siyasatmedar ku li Parîsê hatibûn qetilkirin îtîraf kir. Pekî wiha got: "Li Ewropayê jî endamên wan hene. Divê em tiştêkî ji endamên wan ên Ewropayê bikin. Beriya niha li Parîsê hat kirin lê..." Piştî van gotînan Pekî, pêşkeşvanê bernamêyê Ahmet Hakan mafê axaftinê girt, mijar guhert û weşana xwe domand. Li aliyê din rêxistinên kurdan ên li Ewropayê KCDK-E û TJK-E'yê bang li hikûmeta Fransayê kirin ku bi berpirsariya xwe rabe... **R.3**

Ji bo biçê pêşiya HDP'ê pere teklîf kirin

Wezareta Karên Hundir, malbatên ku îdia dikin "zarokên wan hatine revandin" berê wan dide ber avahiya HDP'ê ya Amedê. Yek ji van kesan jî Habîb Gokdag e ku polîsan pere teklîfî wî kiriye. Habîb Gokdag li navçeya Keçiören a Enqerêyê dimîne û birayê wî Omer di sala 2015'an de tev li YPG'ê bûye. Gokdag diyar kir ku polîs zorê didinê ku biçê ber avahiya HDP'ê ya Amedê. Gokdag ji MA'yê re axivî û wiha got: "Du meh berê polîsan telefonî min kir. Ji min xwestin biçim tev li kesên li ber avahiya HDP'ê bibim û li wir rûnim. Ji bo vê jî 5-6 hezar TL pere teklîfî min kirin..." **R.3**

Parastina ziman peywira her kesî ye

21'ê Sibata Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê ye û gelê kurd îsal jî bi çalakîyên cuda vê rojê pîroz dikin. Bi munasebeta vê rojê gelek sazî û rêxistinên kurdan daxuyanî dan û careke din xwestin zimanê kurdî bibe zimanê fermî. Her wiha nivîskarên rojnameya me Munewer Azîzoglu Bazan, Adar Şaman, Amed

Tîgrîs, Zana Farqîn û Valêre vê hefteyê têkildarî roja ziman û girîngiya ziman nivîsandin. Li aliyê din Navenda Lêkolînên Qadê yê Polîtîk û Civakî bi munasebeta 21'ê Sibata Roja Zimanê Zikmakî yê Cîhanê der barê ziman û çandên li Tirkiyeyê lêkolînek kir... **Nûçeyên têkildarî roja ziman / Rûpel: 2-5-7-9**



Ziwan sey leyîr perr dano

Şarêko bê ziwan merde, lal, ker û bêhîş o. Şarê kurd û taybet zî miyanê kurdan de zazayî sey leyîrêka milçikî perr danî, Serdestê ke biwazê şarêk çin bikerê, sere de hêrişê ziwan û kulturê ê şarî kenê. Çimkî zanê ke çinkerdişê şarêk ewil bi çinkerdişê ziwani mumkun o. Ê ke benê bê ziwan sey leyîre tena eşkenê bi leqnaşîşê dest û lînganê xo, îfadeyê rîyê xo, xo îfade bikerê. Merdim çend qisey bikero zî kesêk merdim ra çiyêk fehm nêkeno. Bêrêne yew bibêno û kurdî qisey bikerêne ke wa ziwan û şarê ma yo qedîm ke şaristanî nê erdan ra biyo, wa biyayîşê xo dewam bikerê. Fîkr, çiyayê û rengê merdimî çî bibo zî ganî merdim paştîya yewbinan bigîro. Tarîx ra zî diyar o neyaran ra dost nêbeno... **Valêre / R.9**

Dixwazin tola Garê ji HDP'ê bigirin




Dewleta tirk û hikûmeta AKP'ê bi hemû hêza xwe ya îstixbaratî, bi piştgiriya hêzên navneteweyî, bi amûrên şer ên herî teknîkî û leşkerî xwe yê herî bijarte êrişî herêma Garê kir û piştî binketîneke mezin neçar man paşve vekîşin. Li Tirkiyeyê di serî de siyasatmedar û gelek kes hesabê têkçûnê ji hikûmeta AKP'ê dipirsîn. AKP'ê xwest bi bilindkirina neteweperestî û şovenîzmê vê têkçûna xwe veşêrê û li aliyê din jî bi awayekî aşkera HDP hedef nîşan dan. Parlamentera HDP'ê Feleknaş Uca têkildarî mijarê jî rojnameya me re axivî û anî ziman ku çî dibe bila bibê de gotinên xwe bibêjin û fikra xwe belav bikin... **R.6**

FELEMEZ ULUG

Mizgîniya Erdogan!... R.6

'Çîroka Koçberekî'

Li Rojava di nav şert û mercên şer û şoreşê de xebatên çand û hûnerê berdewam dikin. Ji aliyê Komîteya Çand û Hûnerê ya Kantona Şehbayê ve filmê bi navê 'Çîroka Koçberekî' hat çikirin. Derhêner û senarîstê filmê endamê rêveber ê Komîteya Çand û Hûnerê Abdulêzîz Kosa ye. Filmê 'Çîroka Koçberekî' di çîroka xwe de qala rastiya biêş a ku bi ser gelê Sûriyeyê û gelê Rojava de pêk hatî û bi taybetî şerê dawî yê li dijî gelên Rojava dike... **R. 11**



Helbest zarokên mirov in

Hunermend Hekîm Sefkan pirsên rojnameya me bersivandin û anî ziman ku helbestên mirov wek zarokên mirov in. Sefkan ji bilî stranbêjiyê behsa hunerê xwe yê din kir... **Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4**

Gula di navbera Dîjle ê Ferêt de; Nisêbîn

Nisêbîn, nola deriyê Mezopotamyaya jorîn tê pênasekirin. Dîroka wê xwe dispêre çar hezar û 500 sal beriya zayînê. Li gorî kolandinên arkeolojîyê, cara ewil jî hêla Sûbarûyan ve hatiye avakirin. Sûbarû, pêşiyên kurdan e. Di roja me ya îroj de jî eşîreke bi navê Zebarî heye. Ev eşîr, navê xwe ji Sûbarûyên pêşiyên kurdan distîne. Wezîrê Karên Derve yê Iraqê yê berê, Xoşyar Zebarî jî vê eşîrê ye û

paşnavê xwe jî vî navê qedîm yê pêşiyê kurdan girtiye. Gava meriv dibêje Nisêbîn, yekser Girnewas tê bîra meriv, bi raya min, Girnewas, qutiya reş ya Nisêbîne ye. Heke kolandinê neke bi rêkûpêk li Girnewasê were kirin, ew ê gelek tiştên nayên zanîn derkevin ber ronkahiya rojê. Girnewas, bi vê raza di bin xwe de veşartî, dişêbe candareke avis ya derengmayî... **Agît Yazar / R.12**

Ziman jiyan e, jiyan şîrîn e



Adar Şaman

Mirov xwe temam hîs bike, wê di serî de pêşketinên nakokiyên zihnî û bîrdozî bi xwe re bicemidîne. Ev tê wateya mirov pêşketinên hebûna xwe red bike. Ev jî rê li ber nakokiyên bi xwezaya mirov re dijî asteng dike. Erê béguman mirovê kamil nîne; lê ji bo mirov kamil bibe, têkoşîn pêwîst e. Mirov her tim di nav tamambûna hebûnê de ye. Hebûn heqîqeta mirov e, ya ku her roj ji bo sedema hebûna xwe bide qabûlkirin, berdêl dide...

Lêgerîna azadiyê di temenê zarokiyê de dest pê dike, lewra nakokiyên mirov jî di serî de li hemberî xislet, nebûn û cudahî-rengên civakê dest pê dike. Li hember xwezaya xwe lêpirsîna 'ez kî me, ji ku têm û ez ê biçim ku derê?' bi nakokiyên cihêreng xwe di lêpirsîna heqîqetê re derbas dike. Encama ku mirov di vê lêpirsînê de xwe gihandiyê, heqîqet yek e û hebûna çand, ziman û dîroka mirovahiyê ya ku nehatiye dîtî ango hesabandin e. Êdî bi ferqkirina heqîqeta xwe re nakokiyên 'serdestî, bindestî, xizanî, zengînî, lawazî, jêhatî, azadî û koletiyê' di nav hev de dijî. Dîsa ferq û cudahiya di navbera zayendê de hîn di temenê zarokiyê de dibîne û dixwaze zû fêhm bike, wate bidê.

Çanda serdestiyê, desthilatdariyê bi rêya serdestên me kurdan ve derbasî civaka xwezayî, exlaqî û politîk bû. Çina serdest a kurd, bi qasî ku xulamtiyê ji serdestan re dike û li cem mêtîngerên Kurdistanê xwe şîrîn dike ewqas ji gelê xwe re bikira, vêga zarokên kurdan di dibistanan de bi zimanê dayikê perwerde dibûn û xwedî nasnameyê azad bûn.

Di esasê xwe de civaka kurd civakeke bi çand, hebûn û zimanê xwe ve girêdayî ye. Erê kevneşopiyên civaka kurd gelek in, lê xwedî cihêrengiyê qedîm e. Kurd weke kes ango civak li ku dera dinê dibin bila bibin, tavilê xwe bi her kesî didin qe-

bûlkirin û hezkirin. Ji ber ku li hember çand û zimanê civakan rêzdar in. Kurd xwedî civakeke pîrçandî, zarava û devokên cihê ne. Lê bi qasî ku ewqas zengîniya çandî û civakî heye jî, îro civaka herî feqîr û hejar e.

Mînaka vê ya herî biêş li welêt pêk tê, lê ya herî xembax li derveyî welêt ango li Ewropayê ye ku malbat tevî zarokên xwe dijî. Gelek komên civakên ji neteweyên cuda li Ewropayê penaber in. Nemaze ji welatên Rohilata Navîn, her roj kom bi kom penaber derbasî parzemîna Ewropayê dibin. Lê di van salên dawî de penaberên kurd ên berê xwe didin Ewropayê gelekî zêde ne. Gelek ji van malbatan, tenê ne ji hêla fizîkî ve xwe ji welêt qut dikin, ji hêla 'ruhî, çandî, fikrî û aborî' ve jî xwe bi tamamî ji Kurdistanê qut kirine û dikin. Dema malbat bikeve vî halî, şik tune ye ku zarokên van malbatan jî bi lez û bez entegreyî pergala heylî dibin û di serî de jî zimanê dayikê ji bir dikin. Êdî, mamostayên malê ne de û bav in, zarok dibin mamosteyên dayik û bavan. Dayik û bav ji zarokên xwe fêrî zimanê biyanî

dibin, lê zarok ji dê û bavên xwe fêrî zimanê dayika xwe nabin. Dema mirov bala xwe qenc bide malbatên kurd ên li welatên cuda yê Ewropayê bi cih bûne, mirov şaşomaşo dibe û ji hêla watedayînê ve zehmetiyên dijî. Civaka kurd bi mêvanperwerî û bi şeweyê jiyana xwe ya komunal tê nasîn. Mixabin em dibînin ku ev taybetmendî êdî ne li pêş in, li şûna vê çanda mêvanperweriyê, qutbûna ji civakê û tenêti weke çarenûs tê dîtî. Kes, çarenûsa xwe di 'tenêti û azadiya şexsî' de dibînin. Ev jî tê wateya ku bê ka çiqas bandora çanda rojava li civaka kurd a li Ewropayê dijî kiriye. Her çend ku mafê malbatan heye ji dewletan daxwaza perwerdeya zimanê dayikê bikin jî, mixabin malbat di vê hêlê de gelekî sersariyê dikin û zarokên xwe bi zimanê dayikê nadin xwendin.

Di vê serdemê de ku tu nexwazî, tenekoşî û li ber zilmê serî ranekî kesek tiştekî herî biçûk jî nade te. Ji bo perwerdeya zimanê dayikê têkoşîneke civakî, siyasî û zanyarî pêwîst e bê dayîn. Ev mafê kurdan ê xwezayî ye. Lewre sar-

terast politîkayên qirkirinê li dijî çand û zimanê kurdî tînen ferzê kirin. Civaka ku çanda xwe û zimanê xwe winda bike, şerma herî mezin a mirovahiyê ye.

Ruhê civaka kurd komunal e; her zindî ye û mîna çem diherike, sekin jê re nîne. Dema mesele dibe hebûna neteweyî, bi hemû enerjîya xwe radibe ser pêyan. Îro li her çar parçeyên welêt, hêza herî dînamîk a veguhertinê xwedî biryara têkoşînê, sekin û lêgerîna azadiyê temsîl dike gelê kurd e. Hêj ji niha ve kelecana biharê dijî. Ji ber ku îsal bihar zû bi ser kurdan de hat, zivistan li kurdan bû cejn...

Wê têkoşîna neteweyî hebûna gelê kurd, çand û zimanê kurdî azad bike. Zimanê dayikê bi xwedîderketina tevahî gelê kurd, ji malê heya kuçeyan, ji kolanan heya dibistanan, ji sûkê heya bazarê bila bibe zimanê jiyanê; ziman jiyan e, jiyan şîrîn e.

Roja Zimanê Zikmakî ya Çîhanê li hemû gelên ji bo parastin û hebûna zimanê xwe têdikoşin, bi taybetî li gelê kurd pîroz be.



Li dijî kontrolê kampanya

Tevgera Parastina Azadiya Kesayeta a Malî ya Mexribê, li hemberî nîqaşên ji bo testa keçaniyê ku di van demên dawî de zêdetir ketiyê rojevê, li ser medyaya civakî kampanyayek da despêkirin. Jinên kampanya dane destpêkirin, diyar dikin ku kontrola keçaniyê tecawiz e. Çalakvane hiqûqê ya tevgera 'Malî' Ibtisam Leşkirî tîkildarî kampanyayê axivî û wiha got: "Ev kampanya li dijî tundiyê li ser beden û zayenda jinan e lewre bandoreke derûnî û bêbaweriyê li rûmeta wan dike." **RABAT**



Dê jin edaleta mêran bidarizînin

Meclisa Jinan a HDP'ê di çarçoveya kampanyaya 'Ji bo jinan edalet' de li pêş edliyeya Stenbolê daxuyaniyê. Berdevka Meclisa Jinan Ayşe Acar Başaran bertek nîşanî dorpeçê da û wiha got: "Jin dê çong daneynin. Em ji bo jinan edaleta rastî dixwazin. Daraz serdesta mêran diparêze. Dê jin edaleta mêran bidarizînin. Ne daraza we ne jî polîs û leşkerên we dê nikaribin me asteng bikin. Daraza we ya mêrê serdest dê nikaribe me bidarizîne. Dê jin meran bidarizînin." **STENBOL**



Biyan

Munewer Azîzoglû Bazan

Zimanê çanda maderî

Her çiqas, zimanê dayikê bi giştî bi awayekî yekser bi dayikê ve, bi tîkiliya navbera dayik û zarokê û her wiha bi pêşketina zimanê yekemîn ve bê girêdan jî em dizanin ev gotin di bîngeha xwe de pergaleke derveyî serdestiyê rave dike û ji tîkiliya zimanî ya dayik û zarokê wêdetir gelek wateyên çandî, civakî û dîrokî di nav xwe de dihevin. Çawa ku 'ziman' ne tenê amûrê ji hevdu fêmkirinê ye û yek ji bîngeha nasnameya çandî ya kesa û civakan pênase dike û di heman demê de tîkiliyên serdestiyê (wek mînak di pêvajoyên kolonyal û asimilasyonê de) de bi roleke girîng radibe, 'zimanê dayikê' jî yek ji bîngeha nasnameya çanda maderî ya gerdûnî ye.

Tê gotin peyva 'zimanê dayikê' ji zimanê latînî ji peyva 'lingua materna' tê û di sedsala 12'ê de, ango di serdema navîn de cara yekemîn di nav belgeyan de bi vî awayî hatîye bikaranîn. Bi vî gotinê cudahiya di navbera zimanê perwer-

deyê/olî/fermî û zimanê li nav malê/civakê tê binxêzkirin. Tê zanîn latînî zimanê fermî ya Împaratoriya Romayê bû, heta serdema nû ji hêla dewlet û împaratoriyan rojavayî ve wek zimanê wêje, zanist, politîka û dêrê dihat bikaranîn. Ligel vê di nav gel de zimanê tîkiliyê ne latînî bû û gel bi hev re bi zimanên xwe yên heremî dipeyvîn. Fenomena zimanê dayikê, tîkiliya bêkontrol ango bêyî midaxeleya ji derve, bêyî hewcedariya fêrkirinê, tîkiliya xwezayî ya bînbîr (intuitive) a navbera dayik û zarokê û her wiha mirov û civakê pê-nase dike. Serdestên wê demê ve tîkiliyê çima wek 'zimanê dayikê' û ne wek 'zimanê bavikê' binavkirine, béguman sedemeke xwe heye. Dibe ku mirov vê pîrsê bi kurtasî bi rola dayikê ve girê bide û bibêje ji ber tîkiliya nêz a navbera dê û zarokê ev nav lê hatîye kirin. Lê serdestên wê demê yên vê navê li zimanê ku ji hêla gelan ve tê peyvîn kiribûn, rola jinan a di nav civakê de jî dizanibûn. Ango ev

zîhniyeta serdest bû ku jin dî re wek pîrebok û sêrbaz îlan kir û li qadan ew şewitandin.

Li hêla din, ger em li rastiya dema çanda xwezayî binîhêrin, em dizanin ku wê demê zarok ji hêla dayikekê ve nayê mezinkirin, ji xeynî dayikê civaka derdorê hemû ji bo gihîştina zarok tevdiagerin. Li gorî lêkolînan hin jî civakên ku bi vî awayî zarokan mezin dikin hene û di van civakan de hîn jî çanda maderî xurt e. Ango zarok ji hêla civakê ve tê gihîştin, ne aîdê dê û bav e. Di vê çarçovê de, dayikî kategoriyeke civakî ye û endamên civakê rol û berpirsiyariyên dayikîyê parve dikin. Pîrî caran şîrdayîna dayikê wek mînaka tekane/pîroza a navbera zarok û dê tê nîşandan, lê dîsa tê zanîn ku heta destpêka sedsala 20'an jî zarok di gelek civakan de ji hêla jinên ne dayikên wan, dihatin mijandin. Lewma ye jî gotina 'zimanê dayikê' nikare tenê bi tîkiliya 'dayik û zarokê/a wê ve' bi awayekî teng bê sînorkirin. Ev gotin pergalekê pê-nase dike û ji xeynî

ziman, çanda ku li derdora jinan hatîye avakirin destnîşan dike.

Girêdayî wê mirov dikare bibêje, serdestên ku zimanê latînî bi kar danîn, bi gotina 'zimanê dayikê' dibe ku xwestibin, yê ne wekî xwe' nîşan bikin û bi vî awayî 'serdestbûna xwe' (û bindestbûna yê ne wekî xwe) îlan bikin. Ev hişmendîya kolonyal di bikaranîna teza 'cudahiya serdest û bindestan' de navendî ye. Li hêlekê pergala, pêşketî, perwerdekirî, fermî, siyasî û dewletî heye û li hêla din pergala, paşdemayî, neperwerdekirî (kovî), nefermî, civakî û nedewletî heye. Pir ne zehmet e ku mirov pê derxîne, zimanê dayikê li kîjan milî dikeve. Yekcar ji ber vê sedemê ye ku heta niha bi gotina 'zimanê dayikê' bi giranî zimanên gelên xwecihî (indigen), yê ne netewedewlet û nefermî tê qestkirin.

Li hêla din fenomena 'ziman' wek yek ji taybetmendiyên hevpar ên 'netew(dewlet)ekê' tê pê-nasekirin jî yek ji îcadên sedsala 20'an e. Xwesa-

zîkirin li gorî esasê neteweperestiyê ya 'yek ziman, yek netew, yek ol'ê li dijî rastiya civakan e. Tu civak ne homojen e, ne yek zimanî ye û ne jî yek çandî/olî ye. Di ser de bi gotina 'zimanê fermî' serdestiya li ser zimanê avakirin, di navbera 'zimanên dayikan' de ferq û cudahî tê kirin; an jî cihêrengiya wan tê windakirin.

Femînîst ji perspektîfa xwe gotina 'zimanê dayikê' bi hinceta ji ber tîkiliya jinan û navmalê ji nû ve ava dike rexne dikin û dibêjin 'ev peyv ji hişmendîya ku dê wek berpirsiyara mal û zarokê dibîne û bav jî wek berpirsiyarê derve û kar dibîne tê.' Her çiqas ev tespît ji hêlekê ve di cih de be jî li hêla din mayîna bi vî rexneyê, wateya wê ya berfireh ku min xwest li jor diyar bikim, piştperde dike. Wekî min got, dibe ku ev peyv ji hêla serdestan ve jî bo 'bêqîmetkirina çanda maderî' û pê-nasekirina 'yên ji xeynî wan' hatibe bikaranîn, lê divê em peyvan jî ji dîlîtiyê xelas bikin û wate û îtibara ku heq dikin, dîsa li wan vegeyrînin.

Qebûl kirin ku MÎT'ê Komkujiya Parîsê kiriyê

Serokê Daîreya Îstixbaratê yê Serfermandariya Giştî yê berê Îsmail Hakki Pekin, di bernameyê televizyonê de rola MÎT'ê ya di qetilkirina her sê jinên kurd ên siyasîmedar de ku li Parîsê hatibûn qetilkirin îtiraf kir.

Omer Guney ê di qetilkirina Sakîne Cansiz (54), Leyla Şaylemez (24) û Fidan Dogan (28) gumanbar bû wê li Dadgeha Cezayê Giran a Parîsê bihata darizandin. Lê ji ber Guney hêj doz dest pê nekiribû di girtîgehê de jiyana

xwe ji dest da, dosye hatibû girtin. Fransayê sala borî biryara ji nû ve bê lêkolinkirin dabû ku tiliya MÎT'ê di qetilkirina de heye an na.

Pekin di bernameyê de ku mijara operasyona Garê ya Hêzên Çekdar ên Tirk (TSK) kir dihat axaftin, pirsên Ahmet Hakan bersivandin. Pekin bersiva pirsê "Tîma mejî ya PKK'ê çar in" a Hakan da û rola MÎT'ê ya di komkujiyê de wiha îtiraf kir: "Zêdetir e. Rêveberiya konseyê heye. Ser serê wê jî

bawer im niha Mûrat Karayilan heye. Di binê wî de jî tîm hene. Mesele ew zêde ji Qendilê dernakevin. Li Ewropayê jî endamên wan hene. Divê em tiştê jî endamên wan ên Ewropayê bikin. Beriya niha li Parîsê hat kirin lê..." Piştî van gotinên Pekin, Ahmet Hakan mafê axaftinê girt, mijar guhert û weşana xwe domand.

KCDK-E û TJK-E'yê bang li hikûmeta Fransayê kirin ku bi berpirsiyariya xwe rabe. **AMED**



Rojnameger Kiliç hat bibîranîn

Nûnerê rojnameya Ozgur Gundemê yê Rihayê û rojnameger Kemal Kiliç, 28 sal berê angoyê di 18'ê sibata 1993'yan de dema diçû malê ji aliyê kesên çekdar ên nayên zanîn ve hat kuştin. Komeleya Rojnamegeran a Dicle û Firatê (DFG)'ê bi malbatê û nûnerên rexistinên civakî re Kemal Kiliç li ser gora wî ya li taxa Abdurrahman Dede ya navçeya Eyubiyeyê bi bir anîn. Hevserokê DFG'ê Serdar Altan, malbata Kiliç, hemîşeyên Kiliç, Parlamentera HDP'ê ya Rihayê Ayşe Surucu û rêveberên HDP'ê tev li biranînê bûn. **RIHA**

Grev ket meha 4'emîn

Navenda Nûçeyan

Girtiyên siyasî yê ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê Mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 21 sal in li Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Îmraliyê girtî ye û bînpêkirinê mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya girtiyên siyasî ku koma 17'emîn dewr girtiye, zêdetirî 90 roj in dewam dike.

Li Wargeha Penaberan a Mexmûrê, jinan di 18'ê kanûna 2020'an de li dijî

Li girtîgehên Tirkiye û Kurdistanê girtiyên siyasî li dijî tecrîdê û zextên li girtîgehan dest bi greva birçîbûnê ya dorveger û bêdem kirin û çalakiya ku li bi dehan girtîgehan hatiye despêkirin 3 meh li pey xwe hiştin û ket meha 4'emîn. TÛAY-DER'ê bang li gel kir ku li berxwedana girtiyan xwedî derkevin

tecrîdkirina Ocalan çalakiya greva birçîbûnê da despêkirin. Çalakiya ku li Saziya Malbatên Şehîdan a Mexmûrê dest pê kir, nêzî 70 roj in didome.

Hevserokê Komeleya Alîkariya Ji Bo Malbatên Girtiyan (TÛAY-DER) a Şaxa Sêrtê Tahîr Cengîz bal kişand ser asta çalakiya greva birçîbûnê û bang li raya giştî kir ku xwedî li çalakiyê û daxwazên girtiyan derkeve. Cengîz anî zîman ku piştî ku çalakiyên greva birçîbûnê dest

pê kirine gelek malbatan der barê bînpêkirinê mafan de serî li wan dane û got: "Bînpêkirinê mafan ên ve serdemê ji yê salên 80 û 90'î xedartir in. Êrîşên derûnî û fizîkî yê wê demê niha jî tên kirin. Her wiha ev tişt tên serê malbatan jî. Sirgûn, qedexekirina hevdiştin, qedexekirina hevdiştina bi rêya telefonê re malbat jî tên cezakirin. Bifikirin malbat li Sêrtê ye, lê zarokên wan li Bandirmaya Balikesîrê ne."

Cengîz diyar kir ku rêveberiya girtîgehê gefa şewitandina înfazê li girtiyan dixwe û edî çalakiya dengderxistinê bixwe jî dibê hinceta şewitandina înfazê. Cengîz bi bir xist ku girtî ji ber neheqiyên bi vî rengî dest bi greva birçîbûnê kirine. Cengîz, destnîşan kir ku tecrîda li ser Ocalan, li ser gelê kurd jî tê pêkanîn û wiha got: "Em, ji bo bibin dengê girtiyên di nav çar dîwaran de, divê em bibin yek. Divê em bi rêya saziyan, bi rêya çapemeniyê bibin dengê wan. Ji lew re çavên wan li me ye. Lewma divê em piştigiriya çalakiya greva birçîbûnê bikin."

Ji hunermendan piştgirî

Hunermend Rotînda û Seyid-xan, ji bo çalakiyên greva birçîbûnê bang kirin. Hunermend Seyid-xan da zanîn ku daxwaza çalakiyê daxwaza aşî û biratiyê ye û got: "Tecrîdkirina birêz Ocalan, heqaret e li gelê kurd. Heqaret e, li edaletê. Mirov li dijî van heqaretan daketine kuçeyan û çalakiyan li dar dixin. Tecrîdkirina Ocalan nayê qebûlkin. Lewma şikandina tecrîdê şert e, peywîrek e."

Hunermend Rotînda jî çalakerên greva birçîbûnê silav kirin. Rotînda destnîşan kir ku çalakiya greva birçîbûnê çalakiyê girîng e û got: "Tecrîdkirina birêz Ocalan nayê qebûlkin. Lewma ji destê kê çî tê divê bike." Rotînda bang li her kesî kir ku xwedî li çalakiya girtiyan derkeve.



Tecawizkar hatin berdan

Li gundekî girêdayî navçeya Stewra Mêrdînê di rojên borî de H.B. û R.Ç. yê cerdevan bi hinceta jinek tacîz kirine hatibûn binçavkirin. Li ser giilîkirina vî jînê her du cerdevan hatibûn binçavkirin. Piştî îfade dan cendirmeyan bi fermana dozgeriyê serbest hatin berdan. Hat zanîn ku der barê her du cerdevanan de lêpîrsîn hatiye despêkirin û dest danîne ser sîlehên wan.

MÊRDÎN

Qeyûm pandemî kir hincet

Du serdem in qeyûm şaredariya Colemêrgê bi rê ve dibin. Ewîlî di 11'ê îlona 2016'an de qeyûm avêtin ser şaredariyê û cara duyemîn jî di 18'ê cotmeha 2019'an de. Lê belê di dema qeyûman de gelek nelirêtî hatin kirin. Hevşaredara Colemêrgê Humeyra Armût ku qeyûm avêtin şûna wê, anî zîman ku bi hinceta pandemiyê tenê xebatên beşên jinan hatine sekandin û bi vî awayî xebatên jinan hatine pasîfîzekirin.

COLEMÊRG

'Zanîngeha Xweser' dixwazin

Çalakiyên li dijî tayînkirina rektorê qeyûm a li ser zanîngeha Bogaziçiyê didomin. Bi fermana serokkomarê tirk û serokê AKP'ê R.T. Erdogan, Melih Bulu yê AKP'î wekî qeyûm tayînkirina zanîngeha Bogaziçiyê kirin. Akademîsyenên careke din piştî xwe dan rektorê û daxwaza 'Zanîngeha Xweser' kirin. 328 rêxistinên civakî û demokratîk li dijî tundiya polîsan a li ser xwendekarên zanîngeha Bogaziçiyê, kampanyaya îmzeyan a "Em bi hev re ne" dan despêkirin û 'Zanîngeha Xweser' xwestin.

STENBOL

Ji bo biçê li ber HDP'ê rûnê pere teklîf kirin

Wezareta Karên Hundir a Tirkiyeyê, malbatên ku îdia dikin "zarokên wan hatine revandin" berê wan dide ber avahiya HDP'ê ya Amedê. Yek ji van kesan jî Habîb Gokdag e ku polîsan pere teklîfî wî kiriyê.

Habîb Gokdag li navçeya Keçioren a Enqereyê dimîne û birayê wî Omer di sala 2015'an de tev li YPG'ê bûye. Gokdag diyar kir ku polîs zorê didinê ku biçê ber avahiya HDP'a Amedê.

Gokdag ji MA'yê re axivî û anî zîman ku birayê wî Omer Gokdag, di sala 2015'an de gava li Cizîrê esker bûye, tev li YPG'ê bûye. Gokdag diyar kir ku piştî ku birayê wî tev li YPG'ê bûye polîsan avêtîye ser mala wan û

got: "Herî dawî du meh berê polîsan telefonî min kir. Ji min xwestin biçim tev li kesên li ber avahiya HDP'ê bibim û li wir rûnim. Ji bo vî jî 5-6 hezar TL pere teklîfî min kirin. Lê min teklîfa wan qebûl nekir. Carekê jî rû bi rû bi min re axivî û pere teklîf kirin. Tim dibêjin, 'dewlet li piştî te ye' û bi vî awayî dixwazin min qanih bikin."

Gokdag destnîşan kir ku ji ber ku teklîfa polîsan qebûl nekiriyê, zext û zoriyên polîsan zêde bûne û got: "Ji min re gotin, tev li çalakiyên li ber HDP'ê bibe. Gava min got, birayê min bi îradeya xwe ya azad tev li YPG'ê bûye, vî carê gef li min xwarin." **ENQERE**



LÎSTIKVANÊKÎ KOMEDYEN HELBESTVANÊKÎ XEMGÎN IM Helbestên mirov zarokên mirov in

■ Rizoyê Xerzî

Mêvanê me yê vê hejmarê hunermend Hekîm Sefkan e ku hûn wî ji ekranên Med TV û ji koma Berxwedan nas dikin. Ji bo ku em hunermend Sefkan bêtir ji nêz ve nas bikin, me ev hevpeyvîn pê re kir û behsa aliyên wî yên din ên hunerî kir. Sefkan di vê hevpeyvînê de ji bilî aliyê xwe yê stranbêjiyê behsa helbestvanî, pêşkêşvanî, nivîskarî û şanogerîya xwe jî dike.

Ez ne şaş bim, te bi tembûr û stranê dest pê kir an jî şanogeriyê, ka tu pêşîn ji kerema xwe hinekî behsa wê pêvajoyê bike?

Cara yekemîn, ez 11 salî bûm, ger ew bibe bi profesyonelî, ez derketim ser dika şanoyê. Me li kampa zarokên pola 5-6'an, şanoya "Şivanê Derewîn" lîst. Loma ez dibêjim min bi Lîstikvanîyê dest pê kir. Pişt re, me li Gund, komeke stran, şano û govendê ava kir. Lîstikvanê me yê jin tune bûn, me cilê jinan li xwe dikirin û rola jinan dilîst. Ger bê hesab min bi helbestê dest bi nivîsê kir. Gundîyan pir piştgirî da min, min helbest li gorî xwe dewam kir, hem stran gotin hem jî li tembûra xwe xist. Her tişt amator bû lê bi hev re dimeşîyan.

1987'an cara yekemîn ez li Qamişloyê derketim ser dika "Navenda Çandê", helbet bi Eerebî bû. Lê di vê demê de min dest bi serdana Seydayê Tîrêj kiribû, min xwe fêrî teknîk û zagonên helbestê dikir.

Pişt re, min hevalên koma Botan naskirin, ya rast wan ez dîtîm. Di dîtina yekemîn de, êdî ji Navenda Çanda Erebî ya Qamişloyê ve-qetiyam û min bi koma Botan re kar kir. Bi kinî, min her tişt bi hev re kir. Pêşkêşvanî jî wê demê bû. Ew hemû huner in, ne li dij hev in.

Piştî wê yan jî wekî berdewamiya wê te cihê xwe di nav koma Berxwedan de girt, tu dikarî behsa rewş û atmosfera wê demê bikî?

Ew dem dema kelandina her tiştî bû, ji bo min jî destpêkeke nû bû. Her tişt nû bû. Cografiya, têkilî, mirov lê tiştê hebû ku di demê kurt de, hemû hêza min derket ortê. Hevaltiya hunermendên koma Berxwedan, hişt ku afirandin li cem min bibe karekî rojane. Lê min guhertin di xwe de pêk anî, min di ku her kes distrê, kesî ku stranê wek kar ji xwe re hilbijêre tune ye. Pişt re min nas kir ku "çêkirina stranê" bi serê xwe beşeke taybet e, min ji hevalan re got: Hûn bistrên ez ê stranên binivîsim. Me karên pir pîroz kirin. Hêdî hêdî ez ji strangotinê dûr ketim, ez mam bi nivîs û lîstikvaniya şanoyê ve. Di vê demê de, di rojnameya Berxwedan, kovara Rewşen û rojnameya Welat de, min dest avêt gotarê jî. Van karan berdewam kir û heya roja îro hat. Geh qels geh xurt, lê berdewam kir.

Wekî kurdekî çûna xerîbiyê û jiyana li Ewropayê ya dûrî welat, çi erênî çi neyînî, çi guhertin di kesayet û hunera Hekîm Sefkan de kirin?

Bawer im bersiva jorê hinekî bersiva vê pirsê ye jî. Lê bi kinî ez dikarim bêjim. Xerîbî



Hevaltiya hunermendên koma Berxwedan, hişt ku afirandin li cem min bibe karekî rojane. Lê min guhertin di xwe de pêk anî, min di ku her kes distrê, kesî ku stranê wek kar ji xwe re hilbijêre tune ye. Pişt re min nas kir ku "çêkirina stranê" bi serê xwe beşeke taybet e, lewre jî min bi carekê bal û giraniya xwe da ser wî aliyê hunerê

êşeke nayê dîtî, piştî demekê mirov pê dihise. Meselen ez ji lîstikvanekî komedyen bûm helbestvanekî xemgîn.

Rast e, min hêza xwe nas kir, her ku derfet pir bûn, ez bêhtir pêrgî hêza xwe ya veşarî hatim, lê xerîbiyê birîneke mezin di jiyana min de vekir. Temen mezin dibe, lê ez her mam ew zarokê ku nikarîbûm şevêkê bêyî diya xwe xewke.

Îca hew carekê me dît ku di warê helbestê de jî tu hespê xwe dibezîni û ne tenê wiha tu baş jî dibezîni. Gelo çiroka te û helbestê kengî û çawa dest pê kir?

Min li jorê jî got. Min hemû kar bi hev re kirin. Berî ez bêm koma Berxwedan jî min pirtûkek helbestan ji wan re şand. Yanî dibe ku gelek kes texmîn dikin ku min bi Med TV re dest bi helbestê kiriye, ne wisa ye. Heya wê demê derfeteke ku ew behrem diyar bibe tune bû. Lê min helbest hilbijart, loma wiha diyar bû ku pişt re min dest avêtiye helbestê.

Ez ne şaş bim te carekê albûmeke helbestan jî derxistibû, gelo çima te albûm hilbijartibû û ne pirtûk, ji ber xwînerên kurdî

kêm bûn an jî sedemeke din hebû?

Du pirtûkên min çapkirî hene. Meseleya albûmê, min xwest ez dest bi stayleke nû bikim, min kir û heya rayedekê bi ser ketim jî. Di sala 1988'an de jî min bi amatorî kasetek helbestan dagirt. Sê albûmên min hene ne yek.

Heyra te jî xwe ji tu aliyekî çand û hunerê bêpar nehiştiye. Ji denbêjî û sazvanîyê, ta bi helbest, mediyagerî, şanogerî û wênesaziyê, gelo ewqas tişt bi hev re tevan kêm nahêlin? An jî tu hîna li Sefkanê dixwazî digerî, heke te ew dîtibe te ew li ku dît gelo?

Bêguman bi demê re, li serad, bêjing û moxilê ket. Wekî minak min bi regekî profesyonel gog dilîst, her wiha karete. Min her du jî berdand hatim hunerê, min wêne nema çêkirin. Ez sazê êdî tenê ji bo melodiyekê çêbikim, digirim destê xwe. Stranê naxwazim bêjim. Dîsa jî hemû huner in. Her ev pirs derdikeve pêşîya min. Lê min rêya xwe diye êdî. Giraniya min helbest û çêkirina stranan e.

Niha tu xebateke te yan jî projeyeke te ya nû heye, heke tune be çima û heke hebe çi ye?

Êdî dem hatiye guhertin. Yanî Albûm nema çêdibin, bêwate ne. Pirtûkên min hene (çirok, cerebe). Ez ê wan jî çapê re amade bikim. Wekî din ez qet nasekinim. Her dinivîsim, stranan çêdikim.

Heke tu ji xelkê bipirsî wê bêjin helbesta 'Dîrok', lê heke em ji te bipirsî tu bêtir jî kîjan helbesta xwe hez dikî û çima?

"Dîrok" ne helbesteke edebî ya xurt e. Lê li gorî nêrîna min hestên wê helbetê û rengê xwendina min ew gelekî da hezkirin. Wekî din

mirov zêde nikare cudahiye di navbera helbestên xwe de bike, helbestên mirov zarokên mirov in, mirov yekê di ser a din re nabîne.

Ez dixwazim em bi helbestekê xatirê xwe ji xwîneran bixwazin, tu çi dibêjî?

Ez jî spas dikim û dixwazim vê helbestê diyarî we û xwînerên rojnameya we bikim.

Xewnên zaroktiyê

Wê herin serî xewnên min

Xewnên zaroktiyê

Di şeva dawî ya biharên Qamişlo de

Û di bin ezmanekî xemgîn de

Xewnên min ên deşta birîndar

Yên kûr mîna kulên pişta hemalên

berbangê

Hemalên ji bo bidestxistina nanê rojê

û derbaskirina rojêke din ji rojên westiyayî

Wê herin serî xewnên min

Hêviyên min ji cîwaniya delodîni

Rojên xwîngermiyê

Dema bi ezmanan ve dihilperikim

Û min dest diavêt sîwana heyvê

Wê here serî xewna min

Wê here serî xewna min

Dema min ava dikirin bajarên bêzindan

Dinyayeke bêsinor û çavên mirovê wê zuha

Biratî distiran

Xewnên min

Xewnên deşta birîndar

Mêrga mêvanên koçer


Deşta ku li ber stranên deştê dinale

Wê here serî xewna min

Yekbûna bi çiya re

Û azadiya sayî

Bê tirs ez ê bistirê



Hekîm Sefkan kî ye?

Hekîm Sefkan di sala 1970'yî hatiye dinyayê. Helbestvan, stranbêj û şanogerekî kurd e. Sefkan yek ji endamên koma Berxwedan bû. Heta niha 2 pirtûkên wî yên helbestan û albûma wî ya helbestan, bi navê 'Helbestên Bêhna Şevê' hatiye çapkirin. Di komên şanoyê yên cuda de lîstikvanî û pêşkêşvanî kiriye.

Ziman li benda helwesta me ye

Zana Farqînî

Rêxistina Perwerdehî, Zanistî û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO), cara pêşîn di 21'ê Sibata 1999'an de ji bo ku rê li ber windabûna zimanan bigire, dabîn bike ku ziman li saziyên fermî jî bîn bikaranîn, bikaribe berde-wamiya çêşîdiya ziman û çandê ya li ser rûyê dinyayê pêk bîne, destekê li pirzimanîya li nav civakan bike û bikaribe der barê nixên zimanî û çandî de hişmendiyeke li rojevê bide hiştin, ev roj wek Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê ragihand.

Sedemeke girîng a hilbijartina vê rojê heye. Ji lew re di 21'ê Sibata sala 1952'yan de li paytexta Bengladeş Dak-kayê (ku wê hengê di nav sînorên Pakîstanê de bû) gelek endamên Tevgera Zimanê Bengalî hatibûn kuştin. Xwendekarên bengladeşî ji bo zimanê wan wek zimanekî fermî bê naskirin, xwe-pêşandaneke li dar xistibû, lê hêzên dewleta Pakîstanê gule li wan reşandibûn. Pejirandina vê rojê her wisa ji bo bibîranîna vê rewşê ye jî.

Ji ber polîtîkayên netewe-dewletên yekperest bi taybetî di demên modern de, gelek ziman û çand ji holê buriyan. Ev yek encama vê siyaseta monîst e ku ji bilî ziman û çanda etnîsîteya serdest maf nade yê din ên di nav sînor û serweriya xwe de.

Nemaze di sedsala bîstan û vê sedsalê de, ji hêla dewletên xwedî ve karakterê ve, ji ber qedexekirin, bêstatûhiştin û mehrûmkirina zimanên din ên ji perwerdehî û xizmetên gelemperiyê, ji ber siyaseta sîstematîk a asîmilasyonê gelek ziman li ber mirinê ne, di talûkeyê de ne, gef li ser hebûna wan heye û endamên zimanên cuda ên di bin serweriya van cure dewletan de nikarin zimanê xwe veguhêzin nifşên nû.

Em behsa xetereya li ser zimanan, hebûna tehde û pêkûtiyan dikin. UNESCO'yê ji bo vê yekê jî pîvan peyitandine, da ku were zanîn bê ka zimanek

Êdî ji kirina rexneyan û nerazîbûna ji rewşê bêhtir êdî dem dema avêtina gavên pratîk e, bicihanîna erk û berpirsiyê ye, kirina razemeniya li ziman û nifşên nû ye

çi qas di talûkeyê de ye:

- Veguhastina zimanekî ya ji nifşekê li nifşa din
- Hejmara kesên axêverên zimên
- Rêjeya axêverên zimên a li gorî ye-kûna nifûsê
- Guherînên li qada bikaranîna zimên
- Bertekiya zimên a li qad û rewşa nû
- Ji bo hînbûna zimên, ji bo fêrbûna xwendin û nivîsîna bi wî zimanî hebûna materyalên pêwîst
- Helwesta dewlet û saziyan û siyaseta wan, rewşa fermî ya zimên û bikaranîna zimên jî tê de
- Helwesta ferdên wê civakê ya li hemberî zimanê wan
- Mîqdar û wêsfê belgeyên heyî yê eleqedarî zimên.
- Gava em li ser van krîteran hûr bibin em dê bi hêsanî bikaribin rewşa zimanê xwe jî baş hînbibin. Ev hînbûn

jî dê bihêle ku divê mirov ji bo berde-wamî û zindîhiştina zimanê xwe, ji bo bergiriya li piştaftinê, ji bo veguhastina zimên a li nifşên nû û hwd. çi bike.

Li gorî xebatên sosyolenguîst û lêkolînên şirketên rapirsîyê, rewşa zimanê kurdî ne baş e, ji bo zimanê me defa hawarê lê dikeve. Rêjeya bikaranîna kurdî di nav zarok û ciwanan de, li gorî kesên navsere û temenmezîr pir kêmtir e. Li aliyê din, kesên ku asta perwerdehiya wan a bi tirkî çî qas zêde ye, asta wan a asîmilasyonê jî ew qas bilind e. Rêzik û qaydeyê piştaftinê ya sê nifşî bi çargavê diçe.

Mirov dikare gelek mînakên din bide, li ser sedema rewşê û encamên sepanên siyaseta dewletan raweste, rexne li wan û helwesta wan bigire. Rast e, sedem û sersedem ew in. Lê ji bilî rexne û tesbîta rewşê, gelo ne hewce ye ku em berê rexneyan hinek

be jî bidin helwesta xwe?!

Ji lew re, du aliyên vê têkoşîn û xebatê yê ji bo gihîştina vî mafî hene, ku divê bi awayekî paralel bi hev re bîn kirin. Yek jê têkoşîna demokratîk û rewşa ya li dijî siyaseta dewletê ya din jî xebatên ji bo geşedan, bikaranîn, berbelavkirina zimên û xurtkirina hişmendî û hesta zimên a di nav civakê de ye. Bar û berpirsiya sereke ya pêkanîna vê yekê jî dikeve ser piştî civaka kurd a rêxistî ku divê xwedî siyasetekî zimên û plansaziya wê be. Loma ji kirina rexneyan û nerazîbûna ji rewşê bêhtir êdî dem dema avêtina gavên pratîk e. Bicihanîna erk û berpirsiyê ye, kirina razemeniya li ziman û nifşên nû ye. Veguhastina vî emanetî ya li zarokan e ku ew dahatûya zimên in jî.

Ziman hebûn û xwebûn e. Roja zimanê zikmakî li me hemûyan pîroz be û hestgermiya vê rojê jî her timî be.



Desteya bangewaziyê

Ahmed Kanî

Em wek rûspî û rewşenbîrên kurdan, demek dirêj e li ser fermîbûna zimanê kurdî difikirin. Gelo bo li Tirkiyeyê zimanê kurdî bibe zimanê fermî meriv dikare çî bike? Me vê pirsê jî xwe kir û em bi gelek kesan re şewirîn. Di serî de me got, divê ew kesên ku bangewaziyê bikin temsîlyeteke xurt a hemû kurdan bikin. Li ser vê fikrê, me bi hemû rûspî û rewşenbîrên kurdan ên pênc parçeyên welatê xwe re, pêwendiyek li ser vê nameye saz kir.

Desteya bangewaziya bo kurdî

“Kurdî yek ji wan zimanan e ku li Tirkiyeyê bi milyonan axiverên wî hene lê di kar û barên fermî û dezgehên dewletê de bikaranîna wî qedexe ye.

Ji bo ku astengiyên li pêşiya zimanê kurdî ji holê bîn rakirin, em dixwazin kampanyayê berhevkirina înzeyan bidin destpêkirin. Armanca vê kampanyayê berhevkirina 10 milyon îmze û pêşkêşkirina wan jî bo cihên hewce ye ku hemû asteng ji holê bîn rakirin û kurdî bibe yek ji zimanên fermî.

Em rûspî û ronakbîrên kurdan dixwazin desteyeke koordînasyona bangewaziyê ava bikin. Ev desteya bangewaziyê dê teksteke bangewaziyê amade bike û ji hemû partiyên siyasî, platform, înzîyatîf, tor û he-reketên zimanê kurdî re bişîne.

Piştî ku armanca berhevkirina mîlmîlyon milyon, maksîmûm 10 milyon îmze bi cih hat, hem ji bo dezgehên fermî yê li Tirkiyeyê hem jî yê navneteweyî dê serlêdanên fermî bîn kirin û prosesa wê bê şopandin.”

Bi vê nameyê re me bersivên gelek xurt girtin û eleqeyêke bi kelecandî. Jixwe li Bakur saziyên wek PZK'ê ku bi piştgiyariya 9 partiyên ava bûbû, TZÇK'ê ku ji 300 saziyên sîvil ên xemxurên zimên pêk hatî û Komeloya Hezkurdê ya fermî di nav amadekariya plansaziya pêşwaziya 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê de bûn. Heta cara ewil ev hemû sazî bi hev re bi kampanyayek xurt xwedî li hilbijartina darsa bijarte ya kurdî derketin. Di raya giştî ya Tirkiyeyê û Bakurê welêt de eleqeyêke mezin bo mafê zimanî heye. Em bi hêvî ne ku ev eleqeya germ bi se-qaya demokrasiya cîhanê re jî li hev bike û pişgiyêke xurt ji demokratên cîhanê jî bigire.

Li ser vê bîr û baweriyê me bi slogana ‘Ji bo fermîbûna kurdî milyon îmze’, di 31'ê meha çileyê de civînek online a berfireh li dar xist. Bi beşdariya gelek rûspî û rewşenbîrên kurdan civîn nêzîkê çar saetan dom kir. Di civînê de nûnerê saziyên ku me li jorê navê wan nivîsî beşdar bûn. Agahiyên berfireh li ser karê xwe, bi me re parvekirin. Ji bo pê-wîstiya desteya bangewaziyê bi me re hemfikir bûn û ji me re gotin, em bawer dikin ku ev destê dê dikaribe koordînasyoneke neteweyî di navbera hemû kurdên li cîhanê de saz bike. Herî pir pêwîstiya kurdan bi karêkî wiha heye.

Em difikirin ku bi argumentên xurt, ji axaftin û pêşniyazên rûspî û rewşenbîrên kurd ên beşdarî civînê bûne, teksta bangewaziya fermîbûna zimanê kurdî amade bikin. Di 21'ê Sibatê de, bi saziyên xemxurên zimên re, ji raya giştî ya welêt û cîhanê ra pêşkêş bikin.



Amed Tigrîs

Li rejîmên demokratîk û teokratîk rewşa zimanê zikmakî

Ziman nîşan û sembola kesayetî û netewetiyê ye. Nasname û paseporta mirovan e. Ziman yek ji wan elementan e ku têvîlî û taybetiyên takekesî û civatî jî hevdû cuda dike. Nijad û rengê gelên cuda cuda derdixe holê. Ji ber van sedeman ziman mafê mirov e herî xwezayî û rewşa ye. Pêwîst e her kes bi zimanê xwe biaxive, bixwîne, binivîse û perwerde bibîne. Wate û naveroka têgeha ziman gelek berfireh e û tenê bi ziman ve nayê girêdan û tixûbkin. Dîrok, civak, çand, wêje û tore hemû bi ziman ve girêdayî ne. Kesê ku bi zimanê xwe perwerde bibe, di van waran de bi pêş dikeve û dibe xwedî kesayetiyeke serbixwe. Ji xwe bawer e, xwe bextewar û serbilind dibîne, bi pêş dikeve û bi civaka xwe û yê biyanî re digunce. Zimanekî biyanî zû û baş fêr dibe. Rola xwe baş fêr dibe û dikare ji kesan re bibe alîkar.

Ji ber van sedeman di sala 2000'î de UNESCO roja 21'ê meha sibatê li seranserê cîhanê Roja Zimanê Zikmakî diyar kir û xwest ku li hemû welatan ev roj were pîrozkirin û mafê zarokên

kêmeteweyên li kîjan welat dibe bila bibe, divê bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin û perwerde bibin. Ji wê rojê heta îro roja 21'ê adarê li gelek welatan tê pîrozkirin. Dewletên xwedî rejîmên demokratîk daxwaz û prensîbên ku ji aliyê UNESCO'yê ve hatine dîtin û pêşniyazkirin li welatê xwe pejirandin. Di dibistanên xwe de mafê perwerdeya zimanê zikmakî di pratîkê de bi kar tînin. Dîsa Yekitiya Ewropayê jî di qanûna xwe de, der barê zimanê zikmakî de sê xalên girîng qebûl kirin û ji dewletên endamên Yekitiya Ewropayê xwestin ku van sê xalan di pratîkê de pêk bînin:

1. Ziman, mafê her welatî ye, mafêkî herî rewşa û xwezayî ye.
2. Ziman, encamê pirrengîtiyê û wekheviya takekesî û civakî ye.
3. Ziman, pîrsa aştiyê ye, Yekitiya Ewropa ji pêvajoya aştiyê parçeyek e.

Li Swêde ji derî zimanê swêdî li dibistanan ji 100 zimanî bêtir perwerdeya zimanê zikmakî heye. Ez dê di vê nivîsa kurt de, bi tenê bahsa pîrozkirina Roja 21'ê Sibatê, roja zimanê zik-

makî bikim. Li hemû dibistanên swêdî mamosteyên swêdî hefteyek seranser li polên xwe hefteya zimanê zikmakî wek tema bi kar tînin. Li ser naverok û girîngiya zimanê zikmakî radiwestin. Şagirdên wan ên biyanî yê ku li polên wan hene, navê zimanê wan yek bi yek li xêr hatî, çawa yî, spas dikim, heval, roja zimanê dayikê...” Li ser kartonan dinivîsin û bi dîwarê polê ve dizeliqînin. Her zarok li ser ziman û welatê xwe bi qasî çend deqîqeyan diaxive. Dîsa her zarok alaya xwe çêdike û dirêngîne. Alayan bi dîwar ve dikin. Ji welatên xwe wêneyên ku li gel wan hene, tînin û bi hevalên xwe yê polê nîşan didin. Bi zimanê xwe stranên dibêjin, helbestan dixwînin. Roja 21'ê sibatê her mamoste zarokên xwe dike rêzê û li bexçeyê dibisatnê kom dibin. Di destê her şagirdî de alaya wî/wê heye. Hemû zarokên dibistanê pol bi

pol li nav sentrûma taxa xwe çend qor digerin û xelk li wan temaşe dike. Piştî derdûn polên xwe û vê carê mamosteyên zimanê zikmakî yê ku li wê dibistanê dixebitin li pola xwe rûdinin. Mamoste bi şagirdên xwe ve diçin û zarok û mamosteyên swêdî di derheqê ziman û welatên wan de ji wan mamosteyên zimanê zikmakî pirsan dikin.

Armanca pîrozkirina hefteya zimanê zikmakî ew e ku demokrasiyê bi zarokan bidin hînkirin. Wekhevî û hevaltiyê xurt bikin, ferq nexin nav zarokên swêdî û biyanî. Li dijî dijmintiya biyaniyan rawestin.

Mixabin li welatên ku bi rejîmên teokratîk tînin birêvebirin mafê perwerdeya zimanê zikmakî qedexe ye û heta xwestin sûc e. Li wan welatan hîn îro jî polîtîkaya înkâr, asîmîle û cezakirinê berdeyam e. Ji wan welatan yek jê jî ziman û welatê me ye. Li welatê me hîn îro jî mafê zimanê zikmakî nayê naskirin, bi kurdî strangotin an bi telefonê axaftin li nav kolanê li ber çavên her kesî kurd tînin kuştin.

'HDP ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê şensekî mezin e'

Navenda Nûçeyan

Di nav hefteyekê de ji Wanê heta Aydinê û gelek bajaran ji 200 kesî zêdetir endam û rêveberên HDP'ê hatin binçavkirin û binçavkirinê hê jî berdewam in. Helbet tenê ne binçavkirina rêveber, endaman her wiha zextên li HDP'ê roj bi roj zêdetir dibin. Herî dawî bi boneya ku parlamenterên HDP'ê li hember bûyera Garê bertek nîşan dane der barê Huda Kaya û Omer Faruk Gergerlioglu de biryara darazandinê hat dayîn û piştî wê jî serokê MHP'ê Dewlet Bahçeli ji bo girtina HDP'ê serî li dadgehê da.

Parlamentera Amedê Feleknas Uca der barê êrişên li ser HDP'ê, biryara darazandina parlamenteran û rewşa kampanyaya HDP'ê de ji rojnemaya me re axivî. Uca di axaftina xwe de diyar kir ku hikûmet bi êrişan dixwaze hem li derve hem jî li meclisê HDP'ê tune bike.

'Dixwazin HDP'ê krîmînalîze bikin'

Feleknas Uca têkildarî zextên li ser HDP'ê destnîşan kir ku bi salan e êriş bê navber pêk tên û wiha got: "Her roj em bi nûçeyên binçavkirinê radiibin, her roj êrişên li ser partiya me berdewam in. Ji rêveberan heta bi endamên şaredariya me û heta gelê me her roj tînin binçavkirin. Kesê ku hema silav dabe HDP'ê êdî ev dibe sedema binçavkirinê. Em ketine rewşeke wisa ku bi rastî jî bi van girtin û binçavkirinan dixwazin HDP'ê krîmînalîze bikin. Êrişeke bi giştî li ser partiya sêyemîn a meclisê dikin. Dibînin ku HDP mixalefeteke berbiçav dimeşîne roj bi roj

rola wê girîngtir dibe ji ber vê yekê jî dixwazin dengê wê hêzê qut bikin û kilitê li deriyê HDP'ê bixin. Tenê li ser îxbaran êdî hevalên me tên girtin. Em hatine rewşeke wisa ku êdî rojane ji jinan heta ciwanan û rêveberên me bi hincetan tên girtin û binçavkirin. Ji bo bingehê hiqûqî ya girtina HDP'ê amade bikin û bi vî awayî me ji siyasetê qut bikin, bi nijadperestiyê mezin êrişî dayik û parlamenteran dikin. Yanî bi kurtasî ne tenê van her du hefteyan ev 5 sal in ku bi hezaran endamên me rêveberên me tên girtin û binçavkirin. Hem di meclisê de êrişên berfireh li ser HDP'ê hene hem jî li derve."

'Siyaseteke cuda pêk tê'

Parlamentera Amedê Uca da zanîn ku hikûmet ji 2015'an ve bi siyaseteke cuda û nijadperest êrişî HDP'ê dikin û ev tişt anî ziman: "Jixwe ji 2015'an şûn ve siyaseteke cuda li ser HDP'ê tê meşandin. Bi rakirina destnedana li ser wekilan peyama xwe ya êrişkar danî holê. Her roj fezleke tên meclisê û dosyayên nû li ser HDP'ên tên vekirin. Di derheqê her xebateke me de hema bêje dosyayên darazandinê tên vekirin. Her xebateke me wek sûc dihesibînin. Mijara Huda Kaya û Omer Faruk Gergerlioglu jî bi heman rengî ye, ev ne cara yekem e ku biryara darazandina wan tê dayîn. Mînak dema hevseroka me Pervîn Buldan diaxive ji axaftina hevseroka me wekilên li cem wê jî tînin darazandin û bi hinceta 'çima



hûn wê hişyar nakin' dosya tên amadekirin. Yanî bi gelek dosyayên ku di naveroka wan de tu tişt tune ye em tên darizandin. Armanca biryara darazandinê çavtirsandin e. Dema em bala xwe didin vê yekê xuya ye ku HDP'ê ji bo ku rastiyê diparêze, hewl didin di meclisê de tune bikin û me bêdeng bikin. Li ba me gotinek heye dibêje rastî şûrê xwedê ye. Rastî çî be em ê jî wê yekê bêjin. Jixwe ji bo vê yekê ye ku her wekilêkî me bi dehan dosya li wan hatine vekirin. Çi dibe bila bibe em ê fikrên xwe bibêjin, em ê gotina xwe bibêjin. Em tev jî di mijara Garê de wek Kaya û Gergeroglu difikirin."

'Tenê bi daxuyaniyan nabe'

Feleknas Uca her wiha da zanîn ku li hember zextên hikûmeta AKP'ê nêzîkatiyên dewletên navneteweyî tenê bi nerazîbûnan dê neçê serî û axaftina

xwe wiha bi dawî kir: "Têkiliyên HDP'ê yê bi dewletên navneteweyî re bi rêya diyalogê di van salên dawî de her çûne bi pêş ketine. Der barê binçavkirinan de jî dostên HDP'ê yê li Ewropayê xwedî lê derketin. Helbet xwedîlêderketina qada navneteweyî heye lê tenê bi nerazîbûnekê em nikarin qala serkeftinekê jî bikin. Hewce ye zorê li hikûmeta AKP'ê bikin da ku ev zextên li ser HDP'ê werin rakirin û pirsgerêkên demokrasî û mafên mirovan bînin çareser kirin. Dewlet û saziyên navneteweyî HDP'ê wek şensekî ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê dibînin û ji bo vê yekê jî hewce ye xwedî li HDP'ê derkevin û van êrişên li ser HDP'ê tenê bi daxuyaniyekê na bi awayekî şênber bertek nîşan bidin. Mînak CPT çavdêriya Îmraliyê dike lê ev 22 sal in ku hê jî biryareke ku tecrîdê ji holê rakin nedaye."



Li Bexdayê xwepêşandan

Piştî êrişa li ser Garê, welatiyan li Bexdayê li dijî êrişên Tirkiyeyê yê li ser axa Iraqê xwepêşandan li dar xistin. Welatiyên ku nêzî sefaretxaneyê Tirkiyeyê kom bûn li dijî êrişên dagirkeriyê yê li ser başûrê Kurdistanê nerazîbûnên xwe nîşan dan. Welatiyan ji hikûmetê xwest ku li dijî êrişan helwest nîşan bide û hêzên Tirkiyeyê ji axa Iraqê derxîne. Welatiyan pankarta "Em êrişên dewleta tirk ên li ser axa Iraqê şermezar dikin û em êrişan qebûl nakin" vekir û dirûşmên li dijî Tirkiyeyê berz kirin. Hêzên ewlekariya Iraqê jî, rêyên derdora sefaretxaneyê girtin û nehiştin tu kes biçê sefaretxaneyê. **BEXDA**

Li hember biryara NATO'yê bertek

Sekreterê giştî yê NATO'yê Jens Stoltenberg diyar kir dê di çarçoveya perwerdekirin û bihêzkirina leşkerên Iraqê de, hejmara hêzên xwe yê li Iraqê ji 400 leşkerî bigihînin 4 hezar leşkeran. Li ser mijarê endamê Lijneya Asayîş û Parastinê yê Parlamentoya Iraqê Bedir Ziyadî axivî. Ziyadî diyar kir ku dê parlamento di biryara xwe ya ji bo derxistina hêzên biyanî yê di nav Iraqê de, gav bi paş de neavêje û wiha got: "Bikaranîna parastina ezmanî ya ji aliyê balyozxaneyê Amerîkayê ya li Bexdayê ve, li dijî serweriya Iraqê ye. Wê Lijneya Asayîş û Parastinê xwedî helwestek zelal be û wê der barê mijarê de nîqaş werin kirin." **BEXDA**



Xweşkanî

Felemez Ulug

Mizgîniya Erdogan!

8'ê sibatê serokkomarê Tirkiyeyê Erdogan aşkere kir ku ew ê roja çarşemê mizgîniyekê bide. Li ser vê 10'ê sibatê di berbanga sibê de artêşa tirk li dijî herêma Garê dest bi êrişêke dagirkeriyê kir. Wezîrê parastinê Hulusî Akar bixwe aşkera kir ku ev êriş bi 40 balafir, bi dehan helikopter û bi hezaran leşkeran ve pêk hatîye.

Di hefteya pêş de, qaşo plan kiribûn ku ew ê biçin leşker û polîsên êsîr ji destê gerilayan derxin bînin Tirkiyeyê û ger bikaribin darbeyê li navenda fermandariya gerîla bixin, li ser vê pesnê xwe bidin. Di vê operasyonê de jî derket holê ku artêşa tirk ji demên borî ti tecrûbe dernexistiye, nezan e û ji alî leşkerî ve jî gelek qels e.

Di vê operasyonê de sûçê dewleta tirk pir giran e. Ew ne tenê qatîlê wan leşkeran e, her wiha qatîlê malbatên wan û qatîlê hestên dostaniya civaka tirk û kurdan e jî.

Rêvebirên dewleta tirk ku hemû nirxên vî gelfî kirine qurbana desthilatdariya xwe, îro bêtî ku şerm bikin, li ser cenazeyên wan leşkeran hamaseteke erzan dikin, gelê tirk li hember gelê kurd sor dikin. Pêwîst e em vê bizanibim ku di vî şerê qirêj de, bi qaşî

desthilatdariya rejîma AKP-MHP'ê sûçdar e, her ewqas jî CHP û ÎYİ Partî jî şîrêkên vî sûcên giran in.

Têkçûna li Garê di artêşa Tirkiyeyê de şikestinek mezin çêkir. Ev şikestî bi her awayî bandora xwe li ser qada siyasî jî bi awayekî xurt da hîskirin. Wek di vê êrişê de jî derket holê ku rejîma AKP-MHP'ê bi şer û pevçûnan ve xwe li ser piya digire. Lewma şikestîna di şer de tê wateya têkçûna qada siyasî jî.

Her çiqas jî bo kuştina êsîran rexneyên tund li artêşê û desthilatdariya AKP-MHP'ê tê kirin jî, di bingeha van rexneyan de têgeha neqebûlkirina binketina artêşa tirk heye. Ji ber vê yekê têkçûna li Garê wek pêvajoyek nû tê binavkirin.

Sê silahşorên şerê teybet ên rejîma AKP-MHP'ê Hulusî Akar, Suleyman Soylu û Hakan Fidan ên bi fermana Erdogan tevdiğerin berpirsên vê binketina dîrokî ne. Lê divê bê zanîn ku bi destê van her sê kesan li Kurdistanê gelek sûcên şer ên mezin pêk hatin. Komkujîya li Garê pêk hat jî yek ji van e. Lewma dema mirov vê êrişê li ser Garê dinirxîne, bi her awayî pêwîstî heye ku pratîka van kesan a

nebaş jî mirov li ber çavan bigire û li gor wê rewşê binirxîne.

Kuştina êsîran, bi her awayî binçavkirina peymanên navneteweyî ye. Lê ev cara yekem e ku artêşa tirk peymanên navneteweyî binçê dike? Naxêr. Ev çek û amûrên li gor peymanên navneteweyî hatine qedexekirin ji aliyê artêşa tirk ve gelek caran li dijî gerîla û kesên sîvil hatine bikaranîn.

Dewleta tirk tevî dewletên din ên cîhanê di 29'ê nîsana 1997'an de Peymana Çekên Kîmyewî îmze kir. Bi vê teahudê kir ku wê van çekan bi tu awayî bi kar neyne. Lê herî dawî ew çek di êrişê li Garê de ji aliyê artêşa tirk ve hat bikaranîn.

Di nêzîdîroka Kurdistanê de ji aliyê dewleta tirk ve çek û gazên kîmyewî di komkujiyên Dêrsimê de hatine bikaranîn. Fermandarên ku qesabên kurdan bûn, di bîranînên xwe de dibêjin: "Me ew weke mişkan di şikeftan de jehrî kirin." Piştî salan derket holê ku Almanyayê ev gaz firotine dewleta tirk.

Ji Dêrsimê, ji 1938'an dema em tên 1988'an, îcar em li Helebçeyê dibin şahidê bikaranîna çekên kîmyewî. Welatên rojavayî jî weke tedarikwanên van çekan derdikevin pêş.

Lê yek ji wan jî ji ber vî sûcî nehatiye darizandin.

Dibe ku ev her du dîrok ji roja me ve dûr xuya bikin lê ji salên 1990'î ve li hemberî gerilayên Kurdistanê jî gelek caran ev çek hatine bikaranîn. Di 17'ê gulana 1994'an de 22 xwendevanên dersxaneyê li Meletiyê berê xwe dan nav refên gerilayan. Li Çiyayê Bêzarê li Semsûrê bi çekên kîmyewî hatin şehîdkirin. Di sala 1995'an de artêşa tirk li herêma Geliyê Şêx Cuma ku dikeve navbeyna Sêrt û Bedlîsê çekên kîmyewî bi kar anî. Di encamê de 80 gerîla şehîd bûn. Li gorî raporên ÎHD'ê di navbera 1994 û 2011'an de li dijî gerilayan 41 caran çekên kîmyewî û biyolojîk hatine bikaranîn. Ji ber bikaranîna çekên kîmyewî 437 gerîla şehîd bûne.

Rejîma AKP-MHP'ê di dema Berxwedana Xwerêberiyê de, li Cizîrê jî çekên qedexê bi kar anîn. Faysal Sariyildiz ku wê demê wekilê HDP'ê yê Şirnexê bû, li ser bûyerê nameyek ji saziyên navneteweyî re şand, xwest li Cizîrê lêpirsîn were kirin. Sariyildiz di nameya xwe de gotibû: "Encamên otopsiyê hene ku tê de gelek ji wan kesên ku jiyana xwe ji dest dane, bi şewitandinê hatine kuştin û laş jî

parçe bûne.

Dewleta tirk di şerê xwe yê li dijî rojavayê Kurdistanê de jî li Efrînê, li Girê Spî, Serêkaniyê û Til Temirê jî çekên qedexê yê kîmyewî bi kar anîn.

Wek di wan mijaran de jî derdikeve holê ku dewleta tirk gelek caran li dijî gerilayan çekên kîmyewî bi kar anîne. Lewma di ser meseleya êsîran de rejîma AKP-MHP'ê dixwaze ser têkçûna xwe ya li Garê bigire. Lê rastiya bikaranîna çekên kîmyewî, ji binketina wan xirabtir e.

Lê dema mirov li têkoşîna PKK'ê dinêre, nêzîkatîya wê ya ji bo êsîran jî aşkera dibe. PKK tîmî li gorî wijdan û exlaqê tevgeriyaye. Di çarçoveya peymanên navneteweyî de berpirsariyên xwe bi cih anîne. Lê dewleta tirk di nav 40 salên dawî de gelek qetlîam kirine.

Ew leşkerên dîl dikaribûn bi diyalog û lihevkerîna pir hêsan a bi PKKê re bigihîjin malbatên xwe, lê dewleta trik li rêyên çareseriyê negeriya. Erdogan xwest ev kesên êsîr ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne, lê nebû. Bi bombyên dewleta xwe ve kuştina girtiyan bû "mizgîniya" Erdogan a ji bo malbatên leşkerên êsîr.

Di roja zimanê zikmakî de rewşa kurdî

Navenda Nûçeyan

Rêxistina Çand, Zanist û Perwerdeyê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO) di sala 1999'an de ji bo zimanên li ser rûyê cîhanê werin parastin, biryara Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê da û di 21'ê Sibata 2000'an de Roja Zimanê Zikmakî a Cîhanê îlan kir. Ev roj piştî qetilkirina xwendekarên Bengladeşê ya ku daxwaza zimanê xwe dikirin, hat îlan kirin. Piştî îlan kirina roja ziman, li gelek deverên cîhanê 21'ê Sibatê tê pîroz kirin û çalakî tîndar kirin.

Li gorî daneyên UNESCO'yê 2 hezar û 500 zimanên li ser rûyê cîhanê bi tunebûnê re rû bi rû ne. Tenê li Tirkiyeyê 18 zimanên zikmakî li ber xetereya tunebûnê ne.

Bi polîtîkayên bişaftin û tune kirinê yên li çar perçeyên Kurdistanê îro zimanê kurdî di bin xetereyê mezîn de ye. Li gorî lêkolîn, zimanzan û hin daneyan axaftina bi kurdî roj bi roj kêmtir dibe.

Anketa der barê ziman de

Navenda Lêkolînên Qadê yê Polîtîk û Cîvakî bi munasebeta 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê der barê ziman û çandên li Tirkiyeyê de lêkolînek kir. Navenda Lêkolînan encamên anketa li ser rewşa ziman bi raya giştî re parve kirin. Navendê di navbera 20'ê çile û 7'ê sibata 2021'ê de li 20 bajarên mezîn, 40 bajarên bi 1476 kesên re anket amade kir. Kesên tev li anketê bûne temenê wan di ser 18'yî re ye. Ji sedî 65,5 kesên tev li anketê bûne kesên zanîngê xwendine û xelas kirine.

Axaftina bi kurdî kêmtir dibe

Li gorî encama vê lêkolînê li Tirki-

Bi munasebeta 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî yê Cîhanê komele û saziyên zimanê kurdî daxuyanî dan. Di daxuyaniyan de hat gotin ji bo astengiyên li pêşiya ziman rabin divê kurd xwedî li ziman derkevin

yeyê di nav zimanên heya de tenê tirkî zimanê fermî û perwerdeyê ye. Li tevahiya Tirkiyeyê axaftina bi kurdî her diçe kêmtir dibe û li malê ji sedî 33 beşa civakê bi tirkî diaxivin. Dî nav zimanan de piştî tirkî herî zêde bi kurdî tê axaftin. Her wiha mirov ji ber zimanê xwe yê zikmakî û çanda xwe, bi cudakariyê re rû bi rû dimînin.

Daxuyaniyên saziyan

Komeleya Nivîskarên Mezopotam-yayê, KURD-PEN, Komeleya Wejekarên Kurd û Komeleya Birca Belek, bi munasebeta 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî daxuyaniyeke nivîskî dan. Saziyan bal ki-

şand ser zext û zordariyên li ser zimanê kurdî û xwestin ku ji bo astengiyên li pêşiya perwerdeya bi zimanê zikmakî ji holê bên rakirin têkoşîn bê dayîn.

'Polîtîkayên qeyûm ziman tune dikin'

Saziyan di daxuyaniya hevpar de bal kişand ser polîtîkayên qeyûman ên li dijî zimanê kurdî û wiha gotin: "Qeyûman li piraniya şaredariyên ku ji destê şaredarên hilbijartî girtine, ji malper û heta tabelayan, kurdî rakirine û hemû qadan li kurdî digirin. Jiholê rakirina zimanekî tunebûna gelekî ye."

Komeleya Lêkolînên Kurdî (Enstîtîya Kurdî ya Stenbolê) jî der barê Roja Zi-

manê Zikmakî ya Cîhanê daxuyanî da û bal kişand ser polîtîkayên tune kirina zimanê kurdî û banga xwedîderketina li ziman kir.

'Zarokên xwe bişînin kursên ziman'

Sazî û komeleyên ziman û wêjeyên kurdî jî bi munasebeta 21'ê Sibatê bang li gelê kurd kirin ku li zimanê xwe xwedî derkeve. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Divê li dijî êrişên li ser ziman û nasnameya gelê kurd yekitiya neteweyî bê avakirin. Divê dayik û bavên kurd zarokên xwe bişînin kursên ziman û çalakiyên çandî yê bi zimanê kurdî."



HDP'ê komîsyona ziman ava kir

Navenda Nûçeyan

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ji bo pêşî li ber polîtîkayên tune kirina ziman bigire, Komîsyona Şopandina Nexşerêya Kurdî ava kir. Armanca vê komîsyonê ew e ku mafê zimanê zikmakî misoger bike, bend û bariyerên li pêş parastin û geşkirina ziman rake, plansaziyeke zimanî amade bike.

Yek ji mijarên girîng ên wê plansaziyê jî perwerdeya kurdî ya navxweyî ye. Ji bo wê jî di 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê de starta perwerdeya kurdî (kirmanckî-kurmancî) ya navxweyî hate dayîn. Hevserokên HDP'ê Perwîn Buldan û Mîhat Sancar, endamên Lijneya Rêvebirina Navendî, endamên Meclisa Partiyê, parlementer, hevserokên bajar û navçeyan, rêveberên partiyê û şewirmendên HDP'ê jî di nav de, gelek endamên HDP'ê di 21'ê Sibatê de dest bi perwerdeya kurdî kir. Ji bo wê perwerdeyê bi zaravayên kirmanckî û kurmanckî 4 ast û gelek pol hatin amadekirin.

Bêdaletiya belavkirina dozên aşiyê

Navenda Nûçeyan

Tê zanîn ku ji meha kanûnê ve bikaranîna aşiya koronayê destpê kiribû. Li gelek welatên cîhanê di rojekê de bi milyonan kesên tîndar kirin. Helbet bi destpêkirina aşiyê her çiqas li gorî temenê kesên dest pê kiribe jî li hin welatên wek Tirkiyeyê pêşî li kesên wek serokkomar, wezîr û piştî wê jî xebatkarên tenduristî û kesên temenê wan di ser 65'yî, dest pê kir.

Bi destpêka bikaranîna aşiyê re li gelek welatên Ewropa, Amerîka û li hin welatên Rohilata Navîn ji aliyê ve hejmara pêketiyên kêmtir dibe, li hin deheran jî ji bo ku bi awayekî bêdalet dozên aşiyê tîndar kirin hejmar naguherin. Mînak, li welatên wek Îngilistanê li gorî lêkolînên şirketa bi navê Imperial College Londonê, ji meha çileyê û vir ve hejmara pêketiyên ji sedî 80 daketiye xwarê. Lê li welatên wek Yemen, Sûriya, Sûdana Başûr, Somalî û li Etiyopyayê hem jî ber şert û mercên şer û hem jî ji xizaniyê, hejmarên pêketiyên vîrusa koronayê neguherîne, berevajî vê nêzî 160 milyon mirov di bin rîskê de ne ku qet aşî bi destê wan nekeve.

Şirketên aşiyê

Li gorî encamên dawî yê zanîngêha Amerîkayê ya Johns Hopkinsê li tevahiya cîhanê hejmara pêketiyên koronayê ji 110 milyonî derbas bûye û herî kêmtir nêzî 2,4 milyon kesên jî jiyana xwe ji dest daye. Em dikarin bêjin ku şirke-

tên aşiyê li pey rêyên dê kapasîteya dozên aşiyê hê baştir çawa zêdetir bikin, ketine. Gelek welatên cîhanê tîndar kirin ku şirketên aşiyê wan li derveyî xwe dibînin. Heta li gorî lêkolînan li hin welatên dewlemend jî aşî bi hêsanî nayê bidestxistin.

Programa Covaxê

Tevgera Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) ji bo dozên aşiyê li welatên xizan bi awayekî wekhev were belavkirin, programeke bi navê Covaxê amade kiribû. Li gorî encamên ku WHO'yê parve kiriye, bi vê programê jî negihîştine hedefên xwe. Ji bo bigihîjin vê hedefê tenê ji bo sala 2021'ê pêdiviya wan bi 5 milyar dolarî heye.

130 welatan aşî bi dest nexistiye

Hefteya borî tîndarî 'bêdaletiya' belavkirina dozên aşiyê, sekreterê giştî

yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres, li civîna Netewên Yekbûyî ya Konyaya Ewlehiyê axivî. Guterres da zanîn ku li tevahiya cîhanê 10 welatan jî sedî 75 dozên aşiyê standine lê 130 welat doza aşî hê jî bidest nexistine. Di berdewama axaftina xwe de Guterres diyar kir ku hewce ye bidestxistina dozên aşiyê ji vê bêdaletiya bêhev-seng bi awayekî lezgîn derkeve û banga çalakiyeke kurewî kir ku ji bo her kes bê aşîkirinê, kir.

Li Tirkiyeyê aşî

Tirkiyeyê di meha mijdarê de dozên aşiyê Sînovac ji Çînê anîbû û di meha çileyê de jî dest bi bikaranîna aşiyê hatibû kirin. Heta niha zêdetirî 3 milyon kes hatine aşîkirin û 500 hezar kes jî doza duyemîn a aşiyê bûne. Her wiha bi tevahî hejmara kesên hatine aşîkirin jî 3 milyon û 900 hezar kesî derbasbû.



Armanca êrişê li Hewlêrê

Li Hewlêrê di 15'ê sibatê de nêzî Balafirgeha Navneteweyî ya Hewlêrê êrişeke bi moşekan pêk hatibû. Li gorî agahiyên ku Wezaretê Karên Hundir a Başûrê Kurdistanê parve kirî de gelek moşek ber bi bajarê Hewlêrê ve hatine avêtin û li gelek cihên cuda ketine. Di êrişê moşekî ku konsolosxaneyê Amerîkayê û Balafirgeha Navneteweyî ya Hewlêrê hatiye hedefgirtin kesekî biyanî yê sivil hate kuştin û leşkerên amerîkî jî di nav de 5 kes jî birîndar bûbûn. Her wiha wezaretê diyar kiribû ku aliyên peywendîdar der barê bûyerê de dest bi lêpîrsînê kirine.

Hêzên ewlekariyê di 16'ê sibatê de erebeyeke ku di avêtina moşekan de hatibû bikaranîn tevî 4 moşekên katyûşa desteser kirin. Li aliyê din jî Koalîsyona Navneteweyî ya bi serkêşiya DYA'yê diyar kir ku 14 moşek li baregeha Amerîkayê ya li balafirgeha Hewlêrê ketine.

Seraya Ewliya El-Dem

Piştî demekê komeke bi navê 'Seraya Ewliya El-Dem' êrişê li dijî baregeha Hewlêrê girt ser xwe. Heman komê der barê êrişê de wiha got: "Me dagirkeriya Amerîkayê ya li Iraqê hedef girt." Lê tu îsbat li ser îdiayên xwe nedan. Ji aliyê derdora siyasî ve tê îdiakirin ku ew kom girêdayî Hizbullahê Iraqê ya girêdayî Îranê ne û dibe ku di rastiyê de komeke bi vî awayî qet tune be jî. Li ser vê yekê Îranê jî bi daxuyaniyekê ev îdia red kir û da zanîn ku ew li dijî kiriyarên zirarê didin ewlekariya Iraqê ne. Her wiha berdevkê Wezaretê Karên Derve yê Îranê Seîd Xetîb

Zade diyar kir ku Îran mijara ewlehiyê û îstîqrara Iraqê girîng dibîne û ev tişt anî ziman: "Em hemû kiriyarên ku ewlehiyê û aştiya Iraqê tîndar kirin û vî êrişê şermezar dikin."

Girîngiya Hewlêrê

Akademisyenê beşa zanista siyasî û tînkiliyên navneteweyî Dr. Raêd Mesrî tînkildarî mijarê diyar kir ku mijara Hewlêrê di nav pêşbirka dewletên herêmî de ye û wiha got: "Her dewletek hewl dide parekî bi dest bixe da ku di pêşerojê de li ser maseya muzekereyan pêşkêş bike."

'Ya herî nêz Tirkiye ye'

Dr. Raêd Mesrî diyar kir ku li gorî analîzên hatine kirin dibe ku di vî êrişê de rola dewletê tirkê hebe û wiha got: "Ji ber ku li Sûriyeyê derî li Tirkiyeyê hat girtin dixwaze li Iraqê rewşê tevlihev bike. Bi taybetî piştî ku li Sûriyeyê bi pêşengiya Rûsyayê di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) û rejîma Şamê de merheleyeke nû dest pê kir, hêz û zexta Enqereyê ya bandorkirina dosyaya Sûriyeyê jî hat lawazkirin."

Erdogan dixwaze valahiyê dagire

Raêd Mesrî got ku Tirkiye dixwaze di heman demê de Iraq û Îranê bixwe goşeyekê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji ber ku bîngeha çûyî û hatina leşkerî ya Amerîkayê li ser axa Iraqê teng bûye, Erdogan jî dixwaze vî valahiyê dagire. Ev êriş hewldana tevlihevkirina rewşa Iraqê ya ewlehiyê û parvekirina hebûna wê ya stratejîk e."

HEWLÊR

Stara stranan

Mefer Kurdîl

Mîna tu ji çivîkan re bêjî tu çivîk î lê ne-fire, ji wan re gotin hûn bilbil in lê nestirên dengên we bila li vê dinê nemîne. Wan bi ya dilê xwe kir û dengê wan hîn jî li dinê ye û ew ê wer li dinê bin... Bi stranan stîrîn! Gelek ji wan rasterast gotin: "Ez nestrêm ez ê bimrim"

Destên hezkiriyê xwe berda "Mihemmedo Ronî" yî li dû xwe hişt "Meryem Xan"ê. Zêde emir nekir lê heta sax bû li ser vê rêya stranan dengê wê qut nebû. Ji radyoya Bexdayê deng da dinyayê!

Bi ya dilê xwe kir û di tu bajaran de hilnehat weke dinya daristanek be jê re got "Ez Xezal im" dengê wê belav dibû "Eşya Şan" a Kurdî bi hesreta dêya xwe mir lê dev ji stranan berneda îro hîn dengê wê li dinê ye, ew dengê ku tu sî-noran nas nedikir.

Ew jina ku malbata wê bi sirgûnan ji welatê xwe dûr ketibû, ew jina ku li ser wê rêya stranan hîn ew jî û dengê wê jî li dinê ye navê wê "Xana Zazê" ye...

Ji bo di radyoya Urmîyê de kilaman bêje ew jina ku "ji bo avakirina kesayeta xwe hunerê dikir rêzan û rêbera jiyana xwe" ji bo bistrê heta mirinê li ser vê rêyê ku tê gotin wekî xwe kuştibe

hate kuştin. Ew jina bi kilaman serî radikir navê wê "Îran Xanim" bû ji Rohilêt ronahî dida welêt.

Dengê jina ku ji ber zewaca wê tenê mabû û ew jina ku li civatan nikaribû bistrê derket hemberî hezaran li Meydana Qurmizê dengê wê belav dibû navê wê "Sûsika Simo" bû tê zanîn ku dengbêja cara ewil derket ser dikan û deng dida dilan ew bû.

Ew jina ku wexta hatibû dinyayê ji bo ku ne law bû diya wê dixwest bimira, ew jina ku ji bo di radyoya Rewanê de bikaribûya stran bigota dev ji evindarê xwe berdabû, ew jina ku digot "welatê me Kurdistan e" li dûrî welêt hesreta dilê wê deng dabû, ew jina ku stran kiribû wetan ji xwe re navê wê "Aslika Qadir" e, dengê wê pir bi qedr e.

Li gelek astengyan û kul êş û azaran rast hatin jinên kurd lê dev ji hunerê bernedan û bi hezkirinek mezin dan ser şopa dengbêjan.

Yeke a ji wan jinan a ku cara ewil dengê xwe qeyd kir û pîlaq derxist û ji jinên kurd re bû dayik mala wê bû cihê hunera kurdî, 24 salan di radyoya Bexdayê de xebitî ew jina ku şewq dida kilamên kurdî û dibiriqî navê wê "Elmas Xan" bû.

Ew jina ku gund bi gund digeriya ji bo wenda nebe dengê kilam û stranan, ew jina ku noteyan li kilamê kurdî difesilandin, 35 salan xizmet kir di radyoya Rewanê de, navê wê Cemîla Celîl e, hebûna wê ji vî zimanî re delîl e.

Gelek hunermendên din ên jin bi hezkirineke mezin û bi wêrekî dev ji rêya xwe xwe bernedan li ser wê rêya hunerî îro ji keç û xortên kurd re bingehê asê ava kirin. Ji mirinê jî neditirsîya dengê wan li ser mirinê re bû îro gelek ji wan çûne lê mirin nikare bi dengên wan hîn distrên ew; stara kilam û stranan besî wan bû.

Huner, bi hezkirinê û bi baweriyeye xurt neyê avakirin, ew ê zanistî tenê têrê neke helbet bê zanîn nabe lê divê hunermend dilê xwe derxe û deyne pêşberî me ev jî bi bawerîya bi xwe û bi hezkirina ji rêya xwe û li ser wê bingeha ji dilan ava dibe. Bi wan jinên kurd re ew hebû ji ber wê ye îro rêyên tunebûn hene, ne ku ew rê tarî bûn rê tunebûn rêyan ava jî kirin û ronî jî.

Ew dengbêj bûn ne ker û gêj bûn! Bûne dengê "Hedîka Qaso" yî, dengê "Besna" yê dengê "Edûlê"! Gelek caran bûne dengê jineke êzîdî, li çiyayên Şengalê li Kurdistanê hîn digerin. Bûn dengê jineke li gundekî hatibû jibîrkirin, bûn



rêber û dan pêşîya wan. Ew çivîk bûn û firriyan, bûn baskên gelek çivîkên ku firinê ji bîr kiribûn! Divê muzîka kurdî bi-baskbûna xwe ji bîr neke, divê stranbêj

bibin dengê yên li dengê xwe digerin û wan bi dinê bidin naskirin êdî rê heye tenê xweşkirina wê rêyê û keşîfkirina rêyên nû ji me re divê.

Perspektîfa derûniya bindestiyê û vegera li xwebûnê

Sozdar Koçer

Di dîroka Kurdistanê û Rohilata Navîn de, şopa dagirkeriya dewleta tirk di destpêka sedsala 19' mîn de û di heman demê de dagirkeriya welatên biyanî ango welatên rojhilatê cihanê yên ku serweriya xwe bê-sînor li cihanê belav dikirin, xuya ye.

Bi vê dagirkeriyê re, gelek rêbazên qir-kirinê yên ziman, çand, huner, civak, xweza û jiyana komunal, hatin kirin.

Ev ne çavdêriyek nû ye, lê mixabin hîn me van rêbazên tunekirin û bişaftinê, bandora van rêbazan bi xweşikî nê-nirxandiyê û em li ser neskinîne. Heya roja me ya îro me danûstandin, helwest û pêşbawerîya xwe ya li hemberî xwe û komên ku ji aliyê pergalê ve hatine marjinalîzekirin, bi kûrahî li wan nekolaye.

Bi awayekî dogmatîk û parastina xwe ya şexsî, jiyana bi derûniya bindestiyê hatiye berdewamkirin. Bindestiya bi awayê fizîkî ji ber gelek sedeman ji holê hatibe rakirin jî, bandora wê ya biçûkxistin, paşketin, nezaniyê, bêhêvî, bêçarebûn û bêbaweriyê ya li ser gelên bindest hatiyê ferzkirin, dîsa jî domiyaye.

Em rojane dibînin ev derûnî xwe çawa di jiyana me de nîşan dide; di axaftin, fikir û vegera me de. Em ne di ferqê de ne, ev pergala dagirkeriyê xweza û civaka me ji hev de xistiyê û kesayet ji xwebûnê dûr xistiyê.

Gelek mînak hene ku mirov hem li Kurdistanê hem jî li dîsporasayê dibîne. Ji bo ev nixandin teorîk nemîne, ez dixwazim balê bikişînim ser çend serpêhatîyan. Mînaka herî berbiçav 'mîrovê çermspî' ye. Dema ku em mîrovê çermspî dibînin, her tiştê erênî pê ve girêdidin; difikirin ku ew mîrovêkî paqij e, xweşik e, giran e, dewlemend e, di avahiyan de dijî, kar dike, nazik e, zana ye û bi awayekî xwezayî em wî mirovî di çavên xwe de bilind dibînin. Dema ku em mîrovêkî esmer/reş dibînin, em her fikra neyînî pê ve girêdidin. Fikra nepaqijbûnê, paşketinê, nexweşikbûnê, karkerê nav erdan, gundî, nezaniyê û wî mirovî biçûk dibînin. Gotin ne bi tenê li ser reş û spîbûnê ye, lewra li ser hiyerarşî

û pêwendîya hêzê ye, ya di hundirê xwe de dihevine. Reş û spî di bingeha xwe de dualîzmeke hiyerarşîk bi xwe re tine. Ev dualîzm jî ji aliyê dagirkerên rojhilatê cihanê ve li ser me hatiyê ferzkirin. Dewletên rojavayê cihanê, ango em zelaltir vebêjin zilamên spî ku cihanê dagir kirin, mirovatî û zanîn li gor pîvanên xwe saz kirine. Mîrovên şaristanî û jêhatî yên spî ne û mirovên esmer/reş ên paşketî, kole û hov in. Ev mînaka biçûk bandora desthilatdaran bi zelalî derdixîne holê û nîşan dide ku çawa nijadperestî û çêbûna çinan bi hêz û ferz dike.

Ev zihniyeta mîrovê spî, bi her şewazê tevgeriyaye û gelê bindest aniyê wê astê ku mirovê bindest ji xwe bêhêvî be. Ev jî tê wateya bê îradebûnê ku mirov bi tenê dibe madeyek ji bo pêkanîna projeyên biyaniyan. Em dikarin bi-bêjin ku raman û şewaza jiyana rojavayê cihanê, li me hatiyê ferzkirin û em bêmîyî ku lê bipirsîn wê teqlîd dikin.

Bandora wê derûniya bindestan li gelên ku li diasporayê – rojavayê cihanê

dijîn hîn jî berdewam e. Ez mînakekê ji perspektîfa Almaniyayê bidim. Jineke kurd a li Almaniyayê mezin bûye û xwendiyê, li gor pîvanên li Almaniyayê di her qadê de xwe bi pêş xistibe jî ji ber çermê xwe yê reş, çîna jê hatî, nijad û zayenda xwe cuda tê dîtîn. Ew Mîrov ji çerxa civaka mezin, civaka spî ya li Almaniyayê tê derxistin. Mîrov xwe bide qebûlkirin, bipişfê jî ne ji wan e! Bixwazî û nexwazî bi nijadperestî û dijberkirinê tu têyî derkirin.

Ev derûniya bindestiyê ku em her tim bi perspektîfa bindestiyê li biyaniyan dinêrin, heyra roja me ya îro li me bandor dike. Em hîn jî li pey şopa qebûlkirinê ne. Em her gava davêjin, xwe biçûk dixin, zanîna xwe kêmbûnê, tecrûbeyên xwe nahesibînin, ji çand û zimanê xwe dûr dikevin, welatê xwe paşketî dibînin da ku em xwe bidin qebûlkirin û xwe temam bibînin ku bigihîjin statuya çîna bilind a Ewropayê.

Her çîqas em bigihîjin statuya çîna bilind jî, ew ê nasnameya me her tim bê dijberkirin û jiyana me wê her di nav hiyerarşiyê de derbas bibe.

Di jiyana xwe ya rojane û medyaya civakî de, dema biyaniyek cil û bergên kurdî li xwe bike, bi zimanê kurdî biaxive, straneke kurdî bibêje, rabûn û rûniştanê kopî bike, gelo çî hîs bi me re çêdibe? Em kêfxweş dibin, wî pîroz dikin û sed kurdên asimîlekirî bi qurban dikin! Ji bo çî? Ev hesta ku êdî em jî wek mîrovên hesibandin û tîrî fêmkirin ji ku tê? Çima em hestiyar dibin dema biyanî li şûna me, me bi cihanê didin naskirin?

Divê em van li van hestên kûr ku bingeha wan derûniya bindestiyê ye bikolin! Divê em her du perspektîfan baş analîz bikin! Ji ber ku encam û bandora kopîkirina çandê li ser mîrovê spî û mîrovê esmer cuda ye. Mîrovê spî bi kopîkirina çanda gelên rojhilatê cihanê ango gel û welatên hatine dagirkirin nayên diskrimîne, krîmînalîze an jî nayên dijber û qirkirin. Lê ji ber çand û zimanê xwe êriş li mîrovê esmer tê kirin û bi nijadperestiyê re rû bi rû dimîne ku dikare heta asta bişaftin û qirkirinê biçê. Ev ne serpêhatiyek nû ye, di dîrokê de gelek mînakên wisa hene. Lewra mîrovên spî tenê dest danayin ser welat, dewlemendiyên sererd û binerdê, her wiha çanda gelên rojhilatê cihanê jî dikin bin serweriya xwe. Ev jî dîsa pîvanên ku hatine danîn baş temsîl dike. Wan mîrovê esmer aniyê wê astê ku ji nasnameya xwe şerm bike û ji aliyê din ve ew bixwe ji ber bênasname û bêçandbûna xwe bi çanda mîrovên rojavayê cihanê nasnameyek nû derdixîne.

Em di jiyana de helwesta xwe, li dijî wê teqlîd û qopîkirina çanda me çawa nîşan didin? Çima em hasas nêzî wê mijarê nabin? Di pratîkê de gelek nêzîkatiyên desthilatê bi zimanê me tîrî rawekirin. Mînak biyaniyek dikare ji me re bêje: Tu kurd î û çawa bi kurdî nizani? Tu kurd î û çawa ne birêxistinîkî yî? Divê bersiv wisa be: Bibore tu ki yî? Tu ki yî, ku nasnameya min didî min û ji min distîni? Tu ki yî, ku ji wê pozîsyona xwe û bi wê takemafiya xwe (privileg) min mehkûm dikî? Duh te ji ber axaftina zimanê kurdî li ser min hukum dikir, îro tu rabûyî min ji bo neaxaftina zimanê kurdî rexne dikî ?

Perspektîfên rojhilatî û rojavayî

Bi perspektîfa rojhilatê cihanê, dema ku mîrovê kurd û mîrovê alman heman beşê di zanîngehê de xwendibin, asta jêhatîbûn û jîrbûnê wek hev be û ev her du kes biçin Kurdistanê, ew ê di zanista wê beşê de kesê alman esas were girtin. Li hemberî kesê kurd wê bêbawerîya zanistê hebe, ew ê qedrê wî kêmtir be û gumana lawazbûnê jê hebe. Ev her du nêzîkatiyên bingeha xwe ji zihniyeta desthilatdaran rojavayê cihanê digirin. Ev zihniyet ji aliyekî ve te bi koletiyê û bêbaweriyê dide qebûlkirin û girêdan, ji aliyê din ve, her çîqas tu koletiyê û bêbaweriyê qebul bikî jî, tu nayêyî qebûlkirin. Ev nêzîkatiya li hemberî gelên bindest hatiyê ravekirin, em di navbera xwe kurdan de dubare dikin. Em qedrê didin biyaniyên spî yên rojavayê cihanê, nadin mîrovên xwe. Bê lêpîrsîn û bi awayekî dogmatîk em xwe teslîmî pîvanên Ewropayê dikin û em tîrî şelandin.

Ev lêpîrsîn pêwîst in ji bo ev sekin û nêzîkatiya ku bingeha xwe ji nijadperestiyê digire di bédengiyê de neyên paşguh kirin. Mijar ne naveroka pirsên biyaniyan e, mijar ew e u kî ji kîjan pozîsyonê van rexneyan li ser nijad û zimên dike? Mijar ew e ku li almanek spî, ji ber nijad, çand û zimanê wî êriş nehatiye kirin û ew nehatiye tunekirin. Çawa dikare bi zihniyeta desthilatê û ruhê ku nasnameya alman dertîne holê, nêzî gelekî bibe ku dagirkerî û bişaftin lê hatiyê ferzkirin û her li ber xwe daye.

Divê li her pozîsyonê bê kolan. Em bi zanîna û hişyarî tevbigerin û koka van nêzîkatiyan bi zelalî derbixin holê û dest pê bikin, xwe bixwe qebûl bikin û bi fizîkî û derûnî xwe ji bindestiyê rizgar bikin!



Ziwan sey leyîrî perr dano

Valêre

Bingeyê 21ê Sibate Roja Ziwanê Dayîke ya Dinya badê xoverdayîşê wendekaranê Bangladeşî ame eştene. Serra 1952î de Bangladeş binê destê Pakîstanî de bi û Pakîstan ziwane înan qedexê kerdî. Serra 1952î de polîsanê Pakîstanî hêrişê wendekaranê Bangalî kerd û çalakîye de 11 kesî merdî. Dima ra Pakîstan mecbur mend û serra 1956î de ziwane ûrdî û Bangalî sey ziwane fermî qebûl bikera.

Rêxistina Yewîya Milletan (BM) ya Perwerdeyî, Zanistî û Kulturî ya Neteweyanê Yewbîyayeyan (UNESCO) zî serra 2000î de seba ke bale bianca ziwane ke binê tehlukeyê çinbîyayîşê de yê 21ê Sibate sey Roja Ziwanê Dayîke ya Miyaneteweyîye îlan kerde. Goreyê raporê UNESCOyî pêroyîya dinya de 7 hezar zi-

wanî yenî qisekerdene û înan ra 3500 ziwane ver bi qedîyayîşê de yê.

Ma zî binê veristîya qedexeyanê serê ziwane û pandemîyî de yewna Roja Ziwanê Dayîke pêşwazî kenê. Tirkîya de zî rewş çiya nîya. Tena ziwane yeno qebulkerdene û ziwane fermî tirkî yo. Tirkîya de kurdî, armenî, suryanî, ereb û xeylê neteweyê bînî zî estê û nê erdî ser o piya ciwiyenê. Her şar bi ziwane xo sey komel yeno qebulkerdene. Verê her çî ziwane yeno û pêroyê têkilîyî merdimîye bi ziwane yenê ronayene. Merdim bi ziwane xo dej û kêfweşîyanê xo diyar kenê. Hetta merdim bi ziwane xo bermeno û huyeno. Şarêko bê ziwane merde, lal, ker û bêhiş o. Şarê kurdî û taybet zî miyanê kurdan de zazayî sey leyîrêka milçikî perr danî. Wayîrê bêwîyan çin o. Ganî kurdî bi xo wayîrê yewbînan bivejîyî. Ziwanê xo binê bixelisnî.

Xelisnayîşê ziwane bi qisekerdişê û yewîya kurdan mumkun o. Ganî neslo ke resîyeno bi kurdî qisey bikero û kurdî bîbo ziwane yewine ê kurdan.

Serdestê ke biwazê şarêk çin bikere, sere de hêrişê ziwane û kulturê ê şarî kenê. Çimkî zanê ke çinkerdîşê şarêk ewil bi çinkerdîşê ziwane mumkun o. Ê ke benê bê ziwane sey leyîre tena eşkenê bi leqnavîşê dest û lingane xo, îfadeyê rîyê xo, xo îfade bikere. Merdim çend qisey bikero zî kesêk merdim ra çiyêk fehm nêkeno. Bêre ne yew bibene û kurdî qisey bikere ne ke wa ziwane û şarê ma yo qedîm ke şarîstanî nê erdan ra bîyo, wa bîyayîşê xo dewam bikero. Fikr, çiyayê û rengê merdim çî bîbo zî ganî merdim paştîya yewbînan bigîro. Tarîx ra zî diyar o neyaran ra dost nêbeno. Her çiqas ke firk çiya bibî zî tena ama eşkenê yewbînan bixelisnî.



Rayîrê azadkerdişê esîranê Garê estbî...



Mahir Uzmez

Artêşa tirke 10ê sibate 2021î de eşkere kerde ke ê hêrişê leşkerî ê bi nameyê Pençe Kartal-2 dayî destpêkerdiş. Raya pêroyê 14ê sibate de pêhesna ke hêrişê leşkerî ê artêşa tirkî de 13 esîrê ke tarîxanê çiya çiyayan de kewtê destê PKK'yî hameyê kîştîş.

Na mesela bi rojano çapemenîye de yeno nîqaşkerdiş, labelê nê nîqaşan miyan de 2 nuqtayê zaf balkêşî estî ke kes nê nuqtayan ser çî nêvano. Ez no nuşte de hewl bida qala nê nuqtayan bikera.

Nuqtaya yewine, meseleya esîranê şerî Peymana Cenevre de ya û ya diyîne zî politikaya PKK'yî ê vera esîran çî yo?

Peymana Cenevre de esîrî...

1948î de bi înzakerdina 190 dewletan ke miyanê înan de Tirkîya zî esta, Peymana Cenevre de babeta esîranê şerî qebul kerdî. No peyman de, şer de hedef girewtîşê sîvilan hame qedexkerdiş û ezîyet, îşkencekerdiş û

kîştîş esîran tamamî qedexê bî. No peyman, denetima herêmê şerî zî da destê Organîzasyonê Xaçê Sûre (Kızıl Haç). Goreyê peymane Xaçê Sûre şêna herêmê şer û herêmê ke hameyê îşgalkerdîş de lêkolîn viraza, esîran reyde şêna pêvînavîş viraza û hetta semedê serbestverdayîşê înan şêna bikewa miyanê hewldayîşan.

Peymana Cenevre hetê dewleta tirke ra taybetî zî Sûriye de zaf reyan hetta îxlalkerdîş û hetta hetê sazîyanê miyandewletan ra zî hamebî rexnekerdiş.

Esîrê Garê

Nê agahîyan reyde ma reyna bîewnî mijara esîranê Garê...

Binê nameyê azadkerdişê esîrê ke destê HPG'yî de bî, bi 40 heb teyareyan reyde herêma Garê ame bombardûmkerdiş û Peymana Cenevre ame îxlalkerdîş. Heta enka dinya de binê nameyê "azadkerdişê operasyonê esîran" de çiyêko winasî nêame viraştîş û no peyman heqêq winasî zî nêdano yew dewletêk.

Eke yew dewlete biwaza leşkeranê xo ê esîran azad bikera, verê heme çî, ganî çiyê ke Peymana Cenevre de hameyê nuştîş bîyara xo vîr, sazîyê ke

hetê Peymana Cenevre ra hameyê erdkardkerdiş agahdar bikera û înan ra hetkarî biwaza. No yew rîyê madalyonî yo, rîyê binê madalyonî de zî persê; Nê esîran kam kîştîş?

Dewleta tirke îddîa kena ke leşkerê esîrî hetê PKK'yî ra hameyê kîştîş, labelê belgeyê ke hetê Komeleya Heqê Merdiman (İHD) ra hameyê eşkere kerdiş de; PKK heya nika 335 esîran serbest vera dayo.

Esîrê yewine ê PKK'yî 5ê Tebaxa 1991î de Şemzînan de hameyê tepîştîş. No qefleyê leşkeran ke 7 tenê bî, 18ê Teşrîna Verêne serra 1991î de koyê Zagrosî de bi rayîrê komek rojnamegeran serbest hameyê verdîş.

Reyna 1992î de komek leşkerî hetê PKK'yî ra hameyê tepîştîş. Na koma leşkeran zî bi rayîrê Xaçê Sûre 20ê nîsana 1992î de hameyê serbest verdîş.

Nê leşkeran ra yew zî Astsubay Yener Soylu bî. Soylu ê rojan de çapemenî de wina vatbî;

"Wexto ke PKK mi Şirnex de esîr girewt, berd serê koyê Cûdî, ewja de verê rîyê mi de Peymana Cenevre hame wendiş. Heta roja ke ez serbest hameya verdîş hetê gerîlayanê PKK'yî ra mi yew muameleyêko xirab nêdî.

Tira pey mi Xaçê Sûre rê name nuşt û Xaçê Sûre dekewt dewre, PKK mi serbest vera da."

Reyna yewna mînako bîn de zî Mazlum-Der, İHD û wekilê partîya REFAHî ê rehmetlî Fethullah Erbaşî dekewtê dewre û leşkerê esîrî ê bi nameyê Ramazan Çelik, Tuncay Kavaklıoglu, Hakan Pusat, İbrahim Yaylali, Tefvîk Ozturk û Sedat Agca teslîm girewtê.

Mesela Coşkun Kirandi zî rayepêroyin nîzdî ra zano... Kê şênê nê minakan hema zî vêşî bikî seke mi cor de nuşt bî, behsê 335 leşker û polîsan yeno kerdiş. Coka ez vana rayîrê çareserkerdişê meseleya Garê bî, labelê hukmatê AKP û MHP'yî kar nêard.

Tirkîya senî hewa nîzdî nê leşker û polîsan bî?

Cewabê nê pirsî zî zaf balkeş o. Leşker û polîsê ke hetê PKK'yî ra hameyê serbest verdîş, pêro zî Mehkemayanê Tirkîya de vejîyayê vernîyê hekim û dozgeran.

Na mijare de Astsubay Yener Soylu enewa vano: "Wexto ke ma hameyê sînorê Tirkîya, rayedarê dewleta Tirkîya Xaçê Sûre rê vatî; enasar yew leşkerê ma çînî yo, ma ci qebul nêkenê. Mi çend telefonî Anqara rê akerd, 3 seatan ra pey mecbûr mendî mi qebul bikere."

Reyna 2007î de 8 leşkerê Tirkîya hetê PKK'yî ra teslîmê heyetê DTP'yî hameyê kerdiş. Nê leşkerî wexto ke hameyê Tirkîya pêro hameyê tepîştîş û bi serran zîndan de mendî. Ê rojan de serverê parlamentoya Tirkîya Mehmet Ali Şahin vernîya kamerayan de vatbî; "Serbest verdina nê leşkeran qet keyfê mi nêard, werikna bimerdinê."

Kê gerek mesela zaf zî derg nêkero. Wina asîyeno ke heta serra 2021î esîrê ke hetê PKK'yî ra hameyê tepîştîş pêro bi yew hewa resayê malbatanê xo. Bado ke artêşa Tirkîya koyê Garê de dest bi operasyonê leşkerî û bombardûmanê teyareyan kerd, 13 leşkerê esîrî weşîya xo dest dayî. Kam çî vanose wa vajjo, gorê fikrê mi, eke PKK heta enka 335 tena esîran azad kerdo se, rayîrê azadkerdişê nê 13 leşker û polîsan zî estbî. Eke Tirkîya şertê Peymana Cenevre kar biardêne, ez vana nê leşkerî do nêmerdene û bi hawayo azade weşîya xo berdewam kerdêne...



Kovara Psyche: Mezg 21ê sibate de vejîyena

Merkezê Xeberan

21ê Sibate Roja Ziwanê Dayîke ya Dinya de kovareka bi ziwane zazakî ya newe vejîyena. Kovare amanc kena ke bi ziwane dayîke literaturê psîkolojî û perwerdeyê taybetî amade bikera. Amadekarîya kovare aşmanê verênanê serra 2020î de dest pêkerd. Hûmara yewîne ya kovare de derheqê babetanê sey otizm, sendromê downî, anksiyete û şîzofrenî de tay meqale û açarnayîşî estê. La yeno waştene ke hûmaranê bînan de ca bidîyo tewir bi tewir nuştayanê bînan zî.

Amadekarê kovarî diyar kenê ke Ehmedê Xasî ra nata ê kesanê ke bi zazakî nuşt verî xo îfade kerd ke çira bi zazakî nusene û wina vatî: "Çünke bi zazakî nuştîş xeylêk wext sey " tewirêkê neweperestî" seke vera rewşe îfraz bi. La ewro bi zazakî nuştîş miyanê zazayan de sey tradîsyonêk o. Ewro bi ziwane standartî û bi ziwane fekkî kitab û kovarî weşaniyenê, ciwan û kokimî bi zazakî nusene û zazakî her platform de xo mojnena. Ma hîni eşkenê xo biresnê literaturêkê weşî. Ma sey komêka psîkolog û mamostayanê perwerdeyê taybetî hedef kenê ke warê xo de na xabeta kovare bi hawayêkê sistematîkî biyarê ca û xebata xo bikere mende. Seba ke no proses de paşt dayo ma, ma Enstîtuya Kurdî ra zî teşekûr kenî. Kesê ke wazenê kovare de ca bigêrê eşkenê email û hesabênê medyaya komelkî ra xo biresnê ma. Qala peyen ma bi çuş û heyecan mîzgîni danî ke kovara ma 21ê Sibate Roja Ziwanê Dayîke ya Dinya de yena şîma ver."

Cernot: **Hesabê twitter: @MezgPsyche**

Instagram: **mezgpsyche**

Gmail: **psychemezg@gmail.com**



Şûjin

Dildarê Amedê

Doza me

Serhedî: Heyra doza me xuya ye, em doza ezmanê xwe dikin.

Mêrdînî: Wele heyra we gavên mezin avêtine. Yê me hîn em doza axa xwe dikin, vaye we doz mezin kiriye êdî hûn doza ezmanê xwe jî dikin!

Tolme

Carekê yekî mêrdînî diçe dibê mewanê hevalekî xwe yê serhedî. Yê serhedî jî mewanê xwe re dibêje me ji te re Tolme çêkirine. Yê amedî jî di dilê xwe de dibêje welehî niha xwarineke gelek xweş e. Li benda xwarinê dimîne. Dema ku xwarinê tê dibîne ku dolme ne. Yê amedî jî gelek ji dolmeyan aciz e û berê zikê xwe daye ber gûz, mewîj û beniyên lewre nikare dolmeyan bixwe.

Serhedî: Keremke were xwarinê bixwe.

Amedî: Ez xwarim.

Serhedî: Tu xwarî biçe xwe rast bike, ma vêca ez çî bikim!

Kî me ez?

Yekî mêrdînî di ber xwe de helbesta Cegerxwîn a 'Kî me ez?' jî hevalê xwe yê serjhedî re dixwîne.

Mêrdînî: Bêhna barûdê kete pozê min Dixwazim hawêr biteqim ji bin

Serhedî: Ma tu ji bavê xwe şerm nakî tu di nav civatê de behsa poza xwe dikî.

Zikê Farqînê


Dêrikî: Tu ji ku yî bira?

Farqînî: Ez ji zikê Farqînê me, lê tu ji ku yî?

Dêrikî: Weleh heyra ez ji zikê ca xwe me!

Ez nema ber xwe dibînim

Yekî Botî çû derziya korona li xwe xist di rê de ber çavê wî xumam bû û nema ber xwe didît. Bi alîkariya hinekan li doktor geriya û got ev çî derzî bû we li min xist. Ez nema ber xwe dibînim. Doktor got: heyra ji xwe tuyê ber xwe nebînî. Mal ne mîrat xalê Botî ma tu dizanî çima ber xwe nabînî? Tu nabînî ji ber ku te berçavka xwe li vir hiştiye.



Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazim hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşênin.

1- Mamê Mino mamani
Tiştêk min heye bi pişte lê bê zik e, bi dest e lê bê ling e, bi çav e lê nabîne
De bêjin ew çî ye?

2- Tiştêk min heye
Bê can e bê ruh e lê wek mirovan diaxive.
Gelo ew çî ye?

3- Tiştêk min heye
Bi qirik e bê ziman e, bi dev e bê diran e dilorîne ne însan e.
Ew çî ye gelo?

Bersivên me ev in:

- 1- Meşk 2- Televizyon 3- Biltûr

Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de, çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pîrsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:

Baso, Naso, Reso

Sê-sê şema

Sê şo sabûn

Şabaş dan.

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:

Tir û tivir di kevçî de


Min tivir xwar tir ma di cî de

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:

Şeş satil şîr



XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- 1. Baltûz, xwişka bûkê dibe çiyê zava
- 3. Nijadek ku kurd û hin gelên din di nav xwe de dihevin
- 5. Meheke biharê
- 6. Nêrê bizinan
- 7. Biçûk, ne girs
- 9. Berpirsekî olî yê xiristyanan
- 12. Xwar, ne rast
- 14. Eşîr
- 15. Navekî dîrokî yê bajarekî kurdan
- 17. Ji bo ku
- 18. Noteke muzîkê
- 22. Reşahiya şevê, şevên zivistanê çawa nin?

JI JOR BER BI JÊR

- 1. Ol
- 2. Nesîhet
- 3. Agir
- 4. Rojeke hefteyê
- 5. Banga ji bo limêjê
- 7. Bajarekî Kubayê yê bi tûtînê navdar e
- 8. Tav
- 10. Xwedî
- 11. Aramî, tenahî, hêminî
- 13. Vê carê
- 14. Oleke kevnar a kurdan
- 16. Alava ku hevîr tê de distirên
- 19. Ax, xwelî, zevî
- 20. Ne hişk
- 21. Sewaleke ku ji bo şîr û hiriyê tê xwedîkirin
- 23. Cihê ku genim lê tê hêran

Bersiva hefteya borî



Amûrên elektronîk fêrî kurdî dikin!

Qedri Esen

Di civaka kurd de, politîkayên bişafatinê yê dewletên serdest û xemariya kurdan li hemberî zimanê wan dibe sedem ku roj bi roj axaftina bi kurdî kêm bibe. Bi kêmbûna axaftina kurdî re, zimanê serdestan jî zêdetir di nav kurdan de berbelav dibe. Lê ev rewş nayê wê wateyê ku xebatên ji bo kurdî tune ne. Her çiqas di asteke têrker de nebe jî xebatên xemxurên kurdî yê jî bo pêşgirtina vê rewşê hene. Ji ber ku sepanên internetê di vî mijarê de bêtir derfetan didin mirovan, di salên dawîn de kurdan jî giraniya xwe dayê ser sepanan.


Yek ji van sepanên ku derfet dide mirov li ser zimanê xwe bixebite, sepana Crowdsourcê ye. Li ser vê sepanê bi dehan zimanan xebatên 'hişê çêkirî' tên meşandin. Bi gotineke din armanca tevgerandina amûrên elektronîk a ji bo xizmeta civakan, li ser vê sepanê xebatên hişê çêkirî tên kirin. Di sala 2020'an de, komeke ji kurdan jî têkilî sepana Crowdsourcê dibin û bi navê Kurdish Crowdsourcê dest bi xebatên kurdî dikin. Kom beriya ku dest bi xebatên Kurdish Crowdsourcê bike jî xebatên teknolojîkirina kurdî yê mîna wergerandina Wordp-ressê, Scratchê û Signalê kirine.

Qeydkirina deng

Herî dawî jî Kurdish Crowdsourcê xebata qeydkirin û kontrolkirina deng a zimanê kurdî ya bi Common Voiceyê da destpêkirin. Ev xebat niha jî didome û kesên ku bixwazin dikarin li ser Common Voiceyê dengê xwe qeyd bikin.

Têkildarî xebatên Kurdish Crowdsourcê em bi endamê komê Amed Çeko Jiyan re axivîn û Jiyan qala xebatên sepanê kir. Jiyan, diyar kir ku Crowdsourcê platformeke fermî ya

Koma Kurdish Crowdsourcê ya xebatên teknolojîkirina kurdî dimeşîne, bi Common Voiceyê dengên kurdî qeyd dike û amûrên elektronîk fêrî kurdî dike



Googleyê ye û hemû karên li ser vê platformê bi awayê xwebexşî tên kirin.

Jiyan da zanîn ku bi vî platformê her kes dikare piştgiriya bide pêşvebirina xizmetên Googleyê yê zimanan û wiha got: "Wekî mînak, di beşa wergerandinê de tu hevokên îngilîzî werdigerîni kurdî yan jî yê kurdî werdigerîni îngilîzî. Ew hevokên hatine wergerandin dikevin hewzekê. Di beşa pesendkirina wergeran de, hevok him bi kurdî him jî bi îngilîzî tên nîşandan û tu wan wekî rast an jî çewt nîşan dikî. Makîneya wergerandinê ya Googleyê li gorî van wergeran xwe fêrî kurdî dike."

Li gorî derfetê ked tê dayîn

Têkildarî girêdayîna Kurdish Crowdsourcê Jiyan, agahî da ku koma Kurdish Crowdsourcê ne girêdayî şirketekê yan saziyekê ye, her kes li mala xwe li gorî derfetên xwe kedê dide û ev tişt got: "Li ser heman platformê karê wergerandina malpera Common Voiceyê jî tê kirin. Bi vî awayî Common Voice jî ket rojeva me. Piştî wergerandina malperê û tomarkirina 5 hezar peyvan li ser pergala wê, destûra qeydkirin û kontrolkirina dengan hat dayîn. Ji bo tevlêkirina zimanekî wergerandina malperê û tevlêkirina

herî kêm 5 hezar hevokan lazim e."

Common Voice beşek ji inîşiyatîfa Mozillayê ye û ew fêrî makîneyan dike ka mirov çawa diaxivin. Jiyan, got ku dixwazin pêşdebiran bi hêz bikin ku dikarin sepanên newaze yê naskirina dengan ên wekî wergerên hevde û alîkarên dijital ên axaftinê fêm dikin ava bikin û ev tişt anî ziman: "Lê niha piraniya dane yên dengî ku ji bo avakirina van celeb sepanan hewce dikin buha ne û taybet in. Em hêvîdar in ku koma daneyan a Common Voiceyê dê tiştê pêwîst bide pêşdebiran ku tiştên nû çêbikin da ku ew dikarin teknolojîya naskirina dengan ji bo zimanên xwe pêşkêş bikin."

Axaftinan berhev dikin

Jiyan bi lêv kir ku ji bo naskirina dengan hê gerdûntir bibe, Common Voice nimûneyên dengan yê bi zimanên pir tînan axaftin û her wisa yê bi zimanên pir nayên axaftin jî berhev dikin ku pêşkêşkarên bazirganî yê xizmetên naskirina dengan girîngiyê nadin wan zimanan û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Weşandina dane yên dengî yê cur bi cur dê pêşvebiran, mûteşebisan û civakan han bide ku vî valahiyê dagirin. Bi kurtî, ev koma daneyan ku Common Voice ava dike, dê ji bo her kesî vekirî be. Ango pêşdebirên sepanan yan makîneyên têkildar dê ji van daneyan sûdê bigirin."



Le Monde Kurdî ya sibatê derket

Rojnameya Le Monde Diplomatique Kurdî bi hejmarê xwe ya 60'î derket û gihîşt xwînerên xwe. Rojnameya mehane ya bi awayekî dijital derdikeve, bi gotar û analîzên wek 'Îskoçya xeyala serxwebûnê dike', 'Bîrek ku tu kes dawîya wê nabîne', 'Qada Tahîrê semboleke dorpêçkirî', 'Îlîzyonên Kêmbûnê' û hwd. derket.

Di vî hejmarê de Le Monde di beşa nivîsên redaksiyona kurdî de, çih daye gotar û analîzên wekî yê Dr. Nadîre Guntaş Aldatmaz lêkolîna bi sernavê 'Zimanên Mîrata Kultura Dinayê yê di Tehlûkeyê de ne: Mînaka

Kirmanckî (Zazakî)'; zimanzan Reşo Zîlan jî bi sernavê 'Serpêhatiyek bi Apê Mihemed re'; weşanger Koroglu Karaslan li ser pirtûka 'Dr. Seîd, Me Kilîta Çiyê Wenda Kir', nivîsandin. Jînda Zekioglu jî bi nivîskar Firat Cewerî re li ser edebiyata kurdî û serpêhatî û nivîskariya wî hevpeyvîn kiriyê.

Rojnameya Le Monde, di vî hejmarê xwe de rûpelên xwe bi wêneyên wênezasê kurd Tîmur Çelîk xemilandiye. Hunermendê hejmarê 60'î jî Gumuşhaneyê ye ku xebatên xwe yê hunermendiyê li Almanayê didomîne. **PARÎS**

Thumbnail of the magazine cover 'Le Monde diplomatique kurdî' featuring the title and author 'Dr. İsmail Beşikçi'.

'Çîroka Koçberekî' qala êşên gelê Sûriyeyê dike

Li Rojava di nav şert û mercên şer û şoreşê de xebatên çand û hunerê berdewam dikin. Ji aliyê Komîteya Çand û Hunerê ya Kantona Şehbayê ve filmê bi navê 'Çîroka Koçberekî' hat çêkirin.

Derhêner û senarîstê filmê endamê rêveberê Komîteya Çand û Hunerê Abdulêzîz Kosa ye. Di filmê de, qala rastiya biêş a ku bi ser gelê Sûriyeyê û gelê Rojava de pêk hatî û bi taybetî şerê dawî yê li dijî gelên Rojava tê kirin.

Abdulêzîz Kosa der barê filmê de diyar kir ku film jî du beşên bingehîn pêk tê û navê beşa yekemîn jî 'Dara

Payîzê' ye û wiha got: "Di beşa yekemîn de çîroka gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ya ku bi êrişên li dijî gelên di gelek demsalan de hatî kirin û ji jiyana wan tev li hev kiriyê, tê vegotin."

Têkildarî beşa duyemîn a filmê jî derhêner Kosa ev tişt anî ziman: "Navê beşa duyemîn 'Nobetdarê Goristanê' ye. Di vî beşê de jî nobetdar çîroka xwe ji gorê re vedibêje. Di nivîsê de mirî bi hev re nîqaş dikin, li malbatên xwe û sedema sernedana wan jî gorê re ji salan ve dipirsin. Nobedar hewl dide vî yekê ji hevalên xwe re bibêje, lê tu kes jê bawer nake û wî bi dîtina xeyalan tawanbar dikin."

Abdulêzîz Kosa di dawîya axaftina xwe de diyar kir ku bi vî filmê xwestiyê ji jiyana koçberî, penaberî û zilma ku gel dîtîye nîşan bide û bang li kesên koçî derveyî welat bûne kir ku li welatê xwe vegevin.

Her wiha di demek nêz de dê filmê Çîroka Koçberekî li kantona Şehbayê were pêşandan. **ŞEHBA**



Li Reqayê komxebateke wêjeyê hat lidarxistin

Komîteya Çand û Şûnwaran a Meclisa Sîvil a Reqayê, bi hevkarîya navenda çand û hunerê ya Reqayê bi dirûşma 'Çand ji her kesî re' komxebateke wêjeyê li dar xist.

Tevî hejmareke helbestvan, wêjeyanên ji Reqa, Tebqa, Kobanê, Minbic û Dêra Zorê, nûnerên Yekîtiya Rewşenbîrên Reqayê, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Partiya Pêşeroja Sûriyeyê û Meclisa Sîvil a Reqayê beşdarê komxebatê bûn.

Di komxebatê de, hevserokê Navenda Çand û Hunerê ya Reqayê Fîras Remedan axivî û wiha got: "Em ê gelek çalakî û komxebatên çandî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dar bixin da ku têkiliyên di navbera rewşenbîrên herêmê de xurt bibin."

Paşê çîgira hevserokatiya Desteya Çand û Şûnwaran a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Ronahî Hesên, lidarxistina komxebatê pîroz kir û got ku cara yekem e komxebateke bi vî awayî li herêmê tê lidarxistin.

Hesên diyar kir ku komxebatên bi vî awayî dê biratiya gelan xurt bikin.

Di komxebatê de der barê wêjeyan Abdullselam Îcêlî û Mehmûd Zexîra yê nemir de sînevîzyon hat pêşandan.

Paşê beşên komxebatê dest pê kir. Di beşa yekemîn de kurteçîrok, di beşa duyemîn de helbesta akademîk û di beşa sêyemîn de jî helbesta gelêrî hatin pêşandan.

Di beşa kurteçîrokê de 6 wêjevan, di beşa helbestê de jî 16 helbestvan û di beşa helbestên gelêrî de 15 helbestan berhemên xwe pêşkêş kirin.

Divê bê bibîrxistin ku cara yekem e, komxebateke bi vî awayî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê lidarxistin. **QAMIŞLO**



Ji Lîsê 11 pirtûk

Weşanxaneya Lîsê hefteya borî 11 pirtûkên kurdî çap kirin. Weşanxaneya ku 3 pirtûkên Erebe Şemo û 2 pirtûkên Îhsan Colemêrgî çap kirin, romanên nû yê Dilawer Zeraq, Sîdar Jîr û Omer Dilsoz derxistin. Ev pirtûkên ku hefteya borî derketine wiha ne: 3 pirtûkên Erebe Şemo Dimdim, Hopo, Jiyan Bextewar, Ezîzê Gerdenzerî, Fincana Ferfûrî; 2 pirtûkên Îhsan Colemêrgî Şîna Şengalê, Siltanê Kurd Selahaddîn Eyûbî; Lezgin Mistefa Resûl Melayê Cizîrî; Dilawer Zeraq Ruhê Xwebûnê; H. Kovan Baqî Orok; Sîdar Jîr Şerm; Omer Dilsoz 4Kotra 4Çela. **AMED**

Gula di navbera Dîjle û Ferêt de; Nisêbîn¹



Keştiya Alalû

Agît Yazar

Yek caran meriv dike nake li gorî dilê meriv nameşe. Meriv çer jî dike xwesteka meriv nayê cî. Xwestek û armanca meriv dibe nola teyrikê şevxapînok yê şivanan. Tu dibêje aha va êdî min ew girt! Dema tu destê xwe dirêj dikî da ku wî bigrî, hew tu dibînî careke din got pirt û ji nav tilikên te firiya çû.

Girtina wî teyrikî jî li te dibe gir, dibe hesteke jêneger, dibe miraz û mexseda te ya jiyane. Mîna kurmê tir-yakê, xwe di nav xwîna te de tevdi-lîvîne. Meriv bi lîz û cizba jî serhişxweçûyîne dikeve. Rojek tê, meşa li dû wî teyrikî, jî girtina wî xweş-tir û bi coştir dibe. Êdî ne tu dixwazî teyrik bigirî û ne te divê jî dû wî teyrikî vegeerî. Mîna meriv dibêje qey tu teyrik bigirî, ew ê sêr xera bibe. Lema jî meriv dibê dewrêşekî bêşekal û xeftan hul-hulî. Lê dîsa jî meriv jî dû teyrik venagere. Teyrik te li dû xwe digerîne. Tu jî bi vê xwexandîne bextewarî...

Ez jî wer dikim. Digel ku ez dizanim ez ê negihîjim dawîya vê razê, dîsa jî ez li dû vî teyrikê biraz im. Lewra kelecana gera li dû wî, jî girtina wî xweştir e. Teyrik gu-rekê dide xwe û ez li pey wî dikevim.

Sibe zû ye; sorekî soingî li asoyê berbangê belav dibe. Em Çinara Amedê derbas dikin. Dîwarê keleha Zêr-zewanê, nola dêwekî reş, serê xwe di nav berbanga soingî de bilind kiriye.

Nizanim çima, her gava ez di Sultan Şêxmûs re derbas dibim, dengê gufegufa erbaneya Sofî Şêxmûs, di guhên min de deng vedide. Paşê jî ew dîmenê wî yê jî filmê Mem û Zîn li ber çavên min zindî dibe. Te dît çaxa jinika jî Sitiyê re pîriktî kiribû, mizgînê dide Tajdîn ku xwedê lawek daye wî. Hingê Sofî Şêxmûs jî li ber derî rûniştîye, defê li ser destê xwe dire-qîşîne û dicoşîne. Dibe ew dîmen be ya di bin hişê min de hatiye kolandin.

Te dît payîz e û demsala meherê ye. Li ser rîya Mêrdînê li vî alî û li wî aliyê rê, mehservanan di bermîlan de dimis dikeland, bastêq çêdikirin û benî di helawê re dikirin.

Girê Girnewas, bi qasî 4 km dikeve bakûrê Nisêbînê. Girnewas, bi her awayî girekî biraz e. Li serê gir tîrbek heye. Jê re dibêjin "ziyareta Mîr Osman". Li gorî baweriya hinek xelkê herêmê, Mîr Osman mîrê cinan e û Mîr Osman mîrekî mîrxas û ew çend jî xwedî edalet e

Em Mêrdînê derbas dikin. Dengê radyoya FM a Rojava, me motacî stranên youtubê nake. Strana Zeriyên Şeş-dara diqîre. Me tîlên di navbera me, xwişk û birayên me yên Rojava de ye, daye ser milê xwe yê rastê û berûberê tîlê ber bi Nisêbînê ve dimeşin. Têl û dî-regên sînor, nola perdê li ser darê tembûra Hemed Şêxo, bi ahenga stranên diçerixê û li pişt me dimîne. Em digihîjin Nisêbînê. Stran bi dawî dibe û FM nûçeyên serê saetê pêşkêş dike: Xwînerên ezîz, êdî dema em jî dîroka Nisêbîna rengîn ji we re pêşkêş bikin hat.

Deriyê Mezopotamyaya jorîn

Nisêbîn, nola deriyê Mezopotam-yaya jorîn tê pênasekirin. Dîroka wê xwe dispêre çar hezar û 500 sal beriya zayîne. Li gorî kolandinên arkeolojiyê, cara ewil jî hêla Sûbarûyan ve hatiye avakirin. Sûbarû, pêşiyên kurdan in. Di roja me ya îroj de, jî eşîreke bi navê Zebraî heye. Ev eşîr, navê xwe jî Sûbarû-yên pêşiyên kurdan digire. Wezîrê karê derve yê Iraqê yê berê, Xoşyar Zebarrî jî vê eşîrê ye û paşnavê xwe jî vî navê qedîm yê pêşiyê kurdan girtiye.

Li gorî kevaleke hatiye dîtin B.Z 3 hezar sal berê, qralê Someran, Lûgazakîs navê Nîrbo li vî bajarî kiriye. Di nav demajoya dîroka şeş hezar û 500 salî de, gelek nav li Nisêbînê hatine kirin. Hin ji wan navan ev in: Nîrbo, Nisîbîs, Nabîla, Kenge, Nas-û-bîna, Meppîn-sûba, Antî-mosya, Nasîbîna-sarbo, Ahwaz, Nasî-beyn, Nisêbîn û hinekên din.

Lê navê avakarê wê yê yekemîn, angonavê jî hêla Sûbarûyan li Nisêbînê hatiye kirin, hîn nayê zanîn. Dibe ku navê Nisêbînê yê bi sûbarûkî, di bin girê Girnewas de razayî be. Kî çî dizane?

Gava meriv dibêje Nisêbîn, yekser Girnewas tê bîra meriv. Bi raya min, Girnewas, qutiya reş a Nisêbîne ye. Heke kolandîneke bi rêkûpêk li Girnewasê were kirin, ew ê gelek tiştên nayên zanîn derkevin li ber ronkahiya rojê. Girnewas, bi vê raza di bin xwe de veşarî, dişibe candareke avis ya dereng-



mayî. Îro nebe sibê; îlim ew ê çongan bide erdê û bizê. Rojeke bi nîşane û vaye min got!

Mîrê Cinan ê li ser Girnewasê

Girê Girnewas, bi qasî 4 km dikeve bakûrê Nisêbînê. Girnewas, bi her awayî girekî biraz e. Li serê gir tîrbek heye. Jê re dibêjin "ziyareta Mîr-Osman". Li gorî baweriya hinek xelkê herêmê, Mîr Osman mîrê cinan e û Mîr Osman mîrekî mîrxas û ew çend jî xwedî edalet e. Kesên xwe bavêjin dexlê wî û destê xwe li ber wî vegirin, wan destvala venagerîne. Heta hinek ji wan serlêdêran bi şev jî li ber tîrba wî dimînin. Ta seherê li ber serê tîrba Mîr-Osman dua û îbadetê dikin.

Di quranê de sûreya 72'yan a Cin heye. Tê bawerkirin ku ew sûre, bi vê ziyaretê ve girêdayî ye. Loma jî gelek bawermendên misliman bi vê bîr û baweriyê nêzî ziyareta li ser girê Girnewasê dibin.

Di nav xelkê de tê gotin, rojekê xortî-kek gava bi dasê guliyê darê dibire, ji nişka ve şeple lîdixê. Bavê kurikî ti bijîşk namîne lê nagerîne, lê lawik baş nabe.

Bav, ji neçarî lawê xwe tîne ser ziyareta Mîr Osman û bi şev li wir radizê. Di xewna xwe de Mîr Osman dibîne. Derdê xwe jê re dibêje. Mîr Osman jê re dibêje, gava lawê te guliyê darê bîriye, dasa wî li zarokê cinan ê li ser wî guliyê darê bûye dikeve û dibe sebê kuştina wî. Loma jî bavê wî kurikî li lawê te daye û ew bi şeplê xistiye.

Li ser vê yekê Mîr Osman bangî wî cinê li lêwik xistiye dike û jî wî dixwaze ew lawik efû bike. Lê dike nake ew ser-wext nabe û ji ya xwe nayê xwarê. Mîr Osman hêrs dibe û serê wî li şûr dixîne.

Xwedê giravî gava li wan dibe sibe, bav dinêre lawê wî sipîsax bûye(!)

Çi gava tu biçî li ser girê Girnewas, teqez tu yê li çend heb serdêran rast werî.

Ez jî hez dikim gera xwe ya Nisê-bînê, ji Girnewasê bidim destpêkirin. Gava em çûn ser Girnewasê, em li komeke serdêr rast hatin. Jixwe wan jî çavê xwe li hinek kesan digerland, da ku loqim û puskuwîten ji bo xêrê anîbûn li ser ziyaretê, bidin wan.

Ez yekser diçim li gel wan kesan. Ew jî qutiya loqim û puskuwîtan dirêjî min

dikin. Ez çend pîrsan ji wan dipirsim. Her yek ji wan xwedî derdek e. Yên zarokên wan nexweş in, yên zarok ji wan re çênabin.

Ez hîn bi wan jînikên li ber serê tîrba "Mîrê Cinan" Mîr Osman re dipeyivim, hew dibînim kalemêrek çawa bi girgincik bi berpala girê Girnewasê ve radipe-like û tê! Eynê nola gaboxeyekî çavsofî, dibe gufegufa şelwerê wî û ji wê de tê. Ji beşerê tê fêmkirin ku hatina wî ne ji xêrê re ye. Çawa xwe digihîne serê gir, dest bi dujûnan dike. Ez tê derdixînim jineke ciwan a ku di emrê qîza wî de ye, hevîna wî ye. Her çiqas min xwe avêt navbera wan jî, mîrik li min hovenade. Nola lokê hêç, kef li ser deva ketiye û hema hey pelepela wî ye ji hevîna xwe re dijûnên pîs dide.

Nizanim çima min jî zîq li devê wî yê bikef, li simbelê wî yê tibabeke dem di ser boyaxkirina wî re derbas bûye, heta nîvî şîn, ji nîvî berjor ve jî reşekî gemarokî dinêrim. Gava ez li wî kelpoxi yê nola zebêşê payîzê li ber tavê rewîqî dinêrim, hingê ez sebeka ka çima zarokê jî wê jina ciwan re çênabe tê derdixim.

Kalemêr, koma jina dide li ber sînga xwe û wan nola kerî ber bi jêr ve dajo. Ew rewşa hanê, hespên revo tê ber çavê min. Bê çawa hespê revo, mihînen di mahrema xwe de dide ber defa sînga xwe û ber bi çolbeyaran ve dajo, kaloyê min û we jî wan hurmetan wanî dide ber xwe û ber bi jêr ve dajo. Heyteho û heybera wan, qiyameta reş radike!

Ez ji xwe re li wê rewşê dimînim he-yîrî. Ez xwe bi xwe jî xwe re dibêjim, hebe nebe ev daweta cinan bixwe ye û Mîr Osman jî, mîrê vana bixwe ye.

Girnewas; girê Miraza

Xwînerên ezîz. Her efsane, îlim xwe dispêre rastiyekê. Lê di nav demajoyê de, benîademyan li gorî pêdiviyên xwe hinek tişt bi ser ve zêde kirine. Bi vî awayî bêmecalî û lawaziyên xwe, bi rîya wan efsaneyên pilore, hestên xwe der-bîrîne û xwe avêtine dexlê razê gerdûnê.

Kesên li ser dîroka girê Mirazan, bi navê xwe yê din Xerabreşkê lêkolîn kiri-bin, pê dizanin ku li ser girê Mirazan jî ziyaretek hebû.

Girê Mirazan, Girnewas, ziyaret, Mîr Osman!... Xwînerên ezîz. Gelo di bîra we de jî pîrîskên ronahiya razeqê birq veda?

(Didome)

